

Anîmasyon dî sînemaya Kurdî de



Li Amedê haziriya zivistanê...




FOTO: SEDAT ORUÇ/QERECDAŞ

Dî sînemaya Kurdî de anîmasyon

Derhênerê Kurd Havî Ibrahim sala 2008' an bi anîmator Stuart Palmer re hevkarî kir û filma "Kawayê Hesinkar ê Efsanewî" çêkir. Ev filma vî derhênerê li Ingilîstanê, weke anîmasyona yeke-min a sînemaya Kurdî tê qebûlkirin.

Anîmasyon bi giştî weke "tevgera zindî" ya tiştan tê terîfkirin û paşxana wê heta bi sedsala 19' an diçe. Ji teorîsyenên pêşî yê anîmasyonan Norman Mc Laren ev yek weke "hunerê kesên xêzkirî" li literatûra li ser mijarê zêde kir. Filmên anîmasyonê bi bipêşketa teknolojiyê re her çû di qonaxên nû re derbas bû, û roja me ya îro di sînemayê de veguherî meydana hunerî ya gelekî girîng. Piştî salên 1930'î li Emerîkayê li studyoyên Walt Disney, gihişt qonaxê profesyonelîtir ya ku tê de serpêhatiyên qehremanên xêzkirî yê ji bo zarokan dihatin gotin.

Di sînemaya Kurdî de anîmasyon, meydana tîra xwe nû ye ku divê hunermendên Kurd hîna teknîkên wê yê filmçêkeriyê kişf bikin. Li vî meydana Derhênerê Kurd Havî Ibrahim sala 2008' an bi anîmator Stuart Palmer re hevkarî kir û filma "Kawayê Hesinkar ê Efsanewî" çêkir. Ev filma vî derhênerê li Ingilîstanê, weke anîmasyona yekemîn a sînemaya Kurdî tê qebûlkirin. Kawayê Hesinkar li her aliyê Kurdistanê çîroka herî belav a berxwedanê ye. Di filmê de ji bo her saniyeyê 25 resm hatine bikaranîn. Di filmê de hin aliyên kêr ên teknîkî hebin jî animatîrên roja me ya îro bi pirranî wê erênî rexne dikin.

Anîmasyon weke Jokerekê

Di çêkeriya filmên anîmasyonê de, roja me ya îro pêdivî hem bi behremendiyeke taybet a gotinê ya derhêner heye hem jî kapasîteya li asta herî jor a bikaranîna teknîkên kompûterê jî lazim e. Yanî, çîroka tê gotin muhim e, lê ew çîrok çawa tê gotin, bê şik û guman jî pîvanên sereke ye. Em dikarin bi vî awirê wiha dewam bikin, anîmasyon di warê teknîkî de xwedî maneyeke wisa ye: 'gotina ya nikare bê gotin'. Bi vî rengê xwe, mirov dikare bibêje ku ji bo yekê jî sedemên hebûna sînemaya Kurdî, filmên anîmasyonê weke jokerekê ne.

Sînemaya Kurdî her mezin dibe û bi pêş dîkeve, pê re jî hêviyên temaşekeran jî zêde dibin. Di vî pêvajoyê de sînemaya Kurdî kêr ma ku bersivê bide van wêfên temaşekeran. Lê belê ji salên 2000'î ve sînemavandên Kurd jî êdî dest pê kir ku ji nêz ve teknîkên çêkirina sînemayê bişopînin. Êdî wan jî berê xwe da awayê tiştanê gotin, yanî ne tenê çîroka gotin, lê çawa tê gotin jî bo derhênerên Kurd jî muhim bû. Ji ber vî jî wan êdî bi qasî ku çavkani li ber destê wan hebûn, ew bi kar anîn.

4 anîmasyonên di LKFF2020'ê de

Me şahidî li hinan jî van kir; hîna nû di dema Festivala Filmên Kurdî ya Londonê (LKFF2020) ya 11' an jî 15-ê Tebaxê heta 24'ê Tebaxê me hin jî wan dîtîn. Di dîroka sînemaya Kurdî de ev cara yekê bû ku festîvalek online bi rê ve çû û di vî festîvalê de çar fil-

Azad Jannati: Ez çêkirina filmê weke navgîneke naskirina dinyayê dibînim, ji bo ku bigihîjim cewhera mirovan, ji bo bigihîjim wê çand û heqîqeta ez divê, ji bo bigihîjim jîyan, mirovan û evîna bi dilê min...

mên anîmasyon jî hatin hilbijartin da ku bînan nîşandan. Yanî ew jî ji wan 53 kurtefilman bûn ku li seranserê dinyayê bi sedhezaran temaşekarî karî li wan temaşê bikin.

Oryantalîzma di filma Rojava de

Komeke xwendekarên dibistana anîmasyonê ya bi navê "Ecole Georges Melies" -Emmanuel Temps, Hugo Voisin, Marion Bideplan, Guillaume Montoya, Noumi Thiriet - sala 2019' an filma bi navê "Rojava" çêkir. Ev bû yek jî filmên lê herî zêde hat temaşekirin. Di encama êrişê DAİŞ'ê de bavê Rihanê jiyana xwe ji dest dide û Rihan jî tevî nav refên YPJ'ê dibe; film ha wê çîrokê dibêje. Şoreşa Rojava sala 2012' an dest pê kir lê tenê tesîr li Kurdistanê nekir, her wiha veguherî çîroke efsanewî ya ku li dinayê hemûyî bandora xwe kir. Ji ber wê em çîroka filmê

ji nêz ve nas dikin, çîrok a navmala me ye. Herçî behremendiya xêzkirinê, ahenga reng, deng û dublaja di filmê de hatiye bikaranîn, tîra xwe orjînal e û bi dengê mirovan qane bike hatiye çêkirin. Film di warê çîrok û nîrxê hunerî de tîra xwe serketî ye, lê divê em rexneyekê lê bigirin. Ev rexneya me jî ne jî ber wê ye ku 5 derhênerên Fransî film çêkirine, lê jî ber ku destê hunermendekî Kurd pê nebûye, jî wan hemanên otantik ên çandî bêpar maye. Bi vî awayê xwe karakterên di filmê de hemû xwedî xetên Ewropî, welatên rojavayî - ez dikarim bibêjim nexasim jî fransî - ne. Yanî mirov dikare bi dilrehetî rexneya oryantalîzma klasîk lê bike. Mirov dikare vî rexneyê li filma Eva Hudson a bi navê "Keçên Rojê" jî bike. Filma ku bi tevahiya çavkaniyên rojava hatiye çêkirin, bêtî ku hemanên otantik li ber çavan bînin, hatiye çêkirin. Filmeke wisa jî orjînalîya xwe jî dest daye.

Temamîbûna çîrok û estetîkê

Di festîvalê de anîmasyonêke din a hat nîşandan a derhênerê jî Rohîlatê Kurdistanê Azad Jannati ya bi navê "Pattern (mestere)" bû. Filmê ilhama xwe jî bû yereke ne xêrê girtiye; jî komkujîya bi kîmyabaranîna ya li Helebce a 16'ê Adara 1988' an. Di filmê de jinek trawmaya xwe bi mestereyên jî rûresmê yê tevna berrên Kurdî îfade dîke. Derhênerê filmê, Azad piştî nîşandana filmê di gotara xwe ya zindî de got, jî bilî tiştî û cisman wî dimênên zindî jî girtine û pê xwestiye filmê bi rêbazêke realistîr xurtîr bike. Rêbazên besî ên îfadekirina kîmyabarana Helebceyê hene, lê ew tercîh dîke ku bi hûnandina mestereyên li ser tevna berrê ya jinekê behsa vî komkujîyê bike. Azad Jannati yek jî kêr derhêneran e ku hem xwe gi-handiye realîteya estetîk a çîrokê û hem jî kûrahiya surreal a çîrokê. Di sînemaya Kurdî de timî yek jî van tê tercîhkirin. Lê temaşeker bi xêra filma Azad Jannati "Pattern" dikare temamîtiya çîrok û estetîkê bi hev re bibîne. Di dema gotara xwe ya zindî de Azad ev yek wiha îfade kir: "... ez çêkirina filmê weke navgîneke



naskirina dinyayê dibînim, ji bo ku bigihîjim cewhera mirovan, ji bo bigihîjim wê çand û heqîqeta ez divê, ji bo bigihîjim jîyan, mirovan û evîna bi dilê min..."

Mîrasê ya nekarî bê gotin gotiye

Wekî din sala 2019' an Baran Reihani yê jî Rohîlatê Kurdistanê filma Heritage (Mîras) çêkiribû û ev filma wê ya anîmasyonê di LKFF2020'ê de hat nîşandan. Film behsa zarokê dîke ku sax fîlitiye; ew hewl dide mîrasê ji malbata wî maye dewam bike, jî bo vî tedi-koşe. Baran di nava 5 deqîqeyan de hem behsa şer û penaberiyê dîke, û hem jî dikare behsa wê zarokê bike ya ku li maleke xirbe ya wêran sax fîlitiye û kariye hunerê jî malbata wî jê re mayî, tevî bombebranan dewam bike. Ji bo wan filmên anîmasyonê jî ku na nikare bê gotin hatiye gotin, filma Heritage (Mîras) yek jî nimûneyên baş e. Yanî bi rastî jî mumkin e ku mirov filmeke produksiyonê gelekî mezin jî newêribin xwe bidin ber, mirov bêtî ku jî estetîkê tiştêkî wenda bike jî bi teknîka anîmasyonê bibêje.

Dest û trawmaya Ji ber şer

Filma anîmasyonê ya ku Yunus Yildiz sala 2019' an çêkir a bi navê The Hands (Dest) behsa serpêhatiya trawmatîk a zilamekî dîke. Ev zîlam di şer de hewl dide jî destên xwe bireve. Yunus Yildiz, îlustrasyon serketî kiriye. Mirov dikare bi dilekî rehet bibêje, wî kariye trawmayê jî xêzkirina xwe serketî îfade bike.

Ez herî dawî bibêjim, di sînemaya Kurdî de "hunermendên xezê" yê bi qasî Hayao Miyazaki û yê weke wî behremend hene. Di sektora sînemaya Kurdî de anîmasyon hîna pirr ciwan û nû ye. Lê bi xêra anîmasyonê wê belkî jî derfeta me çêbe ku em gelek çîrokan jî nû ve zindî bikin. Ji bo ku em karibin ruh bi wan kesên nikarin bibêjin binin, pêdiviya me bi bêhtîr filmên anîmasyonê û bêhtîr animatîran heye.

* Direktîrê Festivala Filmên Kurdî ya Londonê

Me xwest bi Kurdî be

► Temps: Li piştta fikra çêkirina filmê doza Rojava hebû û hîna mesele bi dawî nebûye. Ji ber wê em dixwazin film bê nîşandan. Ji bo min rûmetek e ku filmê me li Rojava bê nîşandan.



Filma animasyon a kurt a bi navê Rojava di Festîvala Filmên Kurd a Londonê (LKFF) de hat nîşandan û li gorî Komîteya Amedakar ragihandî, filma herî zêde lê hat temaşekirin e. Film behsa Rihanê dike ku piştî şêhidbûna bavê xwe bi xwe dikeve nav şerê li dijî DA-İŞ'ê û bi xwe jî di dema rizgarkirina Kobanê de şehîd dibe. Ji derhênerên filmê Emmanuel Temps dibêje, filma wî li Rojava bi xwe bê nîşandan, ji bo wî rûmeteke mezin e. Weke zimanê filmê jî wan bi zanîn û armanç Kurdî tercîh kiriye. Em bi derhênerê ku fikra projeyê derxist holê, Emmanuel Temps re peyivim.



Luqman GULDIVÊ

Filma Rojava wê meha bê li Berlînê jî di Festîvala Filmên Kurdî a 4'an de bê nîşandan. Li Festîvala Filmên Kurdî ya li Londonê de bû filma herî zêde lê hat temaşekirin. Film ji bo bê nîşandan jî ji bo gelek festîvalan hatiye bijartin. Di filmê de weke çêkerên derhêner navê 5 kesan heye. Her pênc jî ji Fransayê ne. Xwendekarên dibistaneke animasyonê ya nêzî Parîsê ne: Emmanuel Temps, Hugo Voisin, Marion Bideplan, Guillaume Montoya û Noumi Thiriet in. Van xwendekarên Înstîtuya Georges Méliè, li École supérieure de cinéma d'animation (Dibistana Bilind a sînemaya animasyonê) a li Orlyê -li başûrê Parîsê-, par dibistana xwe qedand. Îro jî her yek di beşa xwe de bi karên xwe dadikêvin di nava pişesaziya sînemaya animasyonê li Fransayê. Lê belê xwediyê projeya çêkirina filma animasyon a kurt, Emmanuel Temps e.

Fikra projeya Rojava xwendekarên din li dora wî civandin

Fikra projeyê çawa peyde bû û çawa her pênc derhêner li dora projeyê civiyan; li ser pîrsa min ew wiha li min vedigerîne: "Proje esas a min bû, min

xwest Rojava weke karê xwe, teza xwe ya bidawîkirina dibistanê çêkim. Lê sedema tercîhkirina mijarê, ez wisa bibêjim, hevaleki dêûbavê min heye, ew Kurdekî ji Tirkîyeyê ye û wî jî mejê e ji min re gelekî behsa Kurdan kiribû û behsa kokên xwe kiribû. Ev motivasyona min a sereke bû. Lê divê ez behsa listika şanoyê ya bi navê 'Mon ange (Meleka min)' jî bikim. Li Parîsê hat nîşandan û girîng bû. Lina El-Arabî listikvana wê bû*. Wê nîşanî min da ku ev serpehatî dikare bê adeptekirinê filman. Piştî wê jî min serê xwe bi adaptasyona wê ya kurtefilma animasyonê eşand.

Piştî ku min esasên wê danîn û senaryo hazir kir. Hevalên din jî li dora vê projeyê bi min re xebitin û em her 5 derhêner in. Her yek jî me di karekî de pîspor e, min di karê senaryo, teknîkê û qismî di çêkirina animasyonê de karê xwe kir, hevalên din jî her yekî di karê xwe yê pîsporiyê de xebitin. Mesele Guillaume Montoya layout, dekor, rengandin û kompozîsyon û FX - efektên taybet - çêkir; ew rêberê hunerî yê dekorê bû. Marion Bideplan, hevala me bû ku rêberiya animasyonê kir. Wê planên herî muhim kirin. Wê ekip hemû bi rê ve bir. Wê di senaryoya esasî de jî cihê xwe girt. Herçî hevala me Noumi Thiriet bû, wê rêberiya rengan kir; rengên lewheyên, tercîha rengan jî bo tevahiya filmê wê kir. Wê qismek ji dekor jî çêkir, nexasim jî rengandina dekorê wê çêkir. Lê wê xêz nekir. Hugo Voisin jî karê wî çêkirin û dizaynkirina kesan hemûyan bû. Wî her wiha qismek ji animasyona film jî çêkir. Konseptên jî bo maşîn û tiştên wisa jî wî kirin.

Tesîra şerê li dijî DAİŞ'ê tenê nebû sedema wî. Li aliyekî hem gotina serhatiya qehremaniya şervanên Kurd, li aliyê din, jê û wêde, ev şer jî bo mirovahiyê hemûyî bû."

Lê ciwanekî ku hîna li zanîngehê, ji bo wî çêkirina projeyêke bi vî rengî nexasim jî di meseleya nivîsandina senaryoyê de ma ne zehmet bû. Wî xwe jî kar venedaye, çûye cihê lazîm û li agahiyan pîrsiye, çûye nav civaka Kurd jî. Ew wiha behsa vê pêvajoyê dike: "Ji bo senaryoyê ez çûm nav Kurdan, min pîrs kirin, bi gelek kesan re peyivim, çûm Înstîtuya Kurdî li Parîsê jî heta bi serokê wê re jî peyivim. Ez bi gelek kesan şewirîm û min gelekî xwend, da ku çirok ne hema welê be, lê li rastiya Rojava be."

Ji awayê çêkirinê bêhtir, ev film zimanê xwe bala gelek temaşevanan kişand. Filma 5 derhênerên Fransî bi Kurdî ye; lê çima: "Me bi zanîn wisa tercîh kir. Me xwest ziman Kurdî be. Ji ber wê me metnên diyalog û çirokê dan wergerandin. Me têkilî bi hunermendên Kurd re danî, ew bi me re bûn alîkar da ku em peywendiyên bi hunermendên sînemayê û dublajê re deynin. Wan jî ji dil alîkarî bi me re kir. Dublaj jî wisa hat kirin."

Tonî muzîk bi dilxwazî kir

Prodûktorê li ser filmê navê wî dinivîse, damezrênerê dibistana bilind a sînemaya animasyonê ye, Franck Petitta. Lê sedema ku Festîvala Filmên Kurdî ya Londonê (LKFF) a 11'an ev film weke ya Bakur nîşan da, sedema wê ya muhtemel ev hevkarîya li jor a bi hunermendên ji Bakurê Kurdistanê re ye.

Di filmê de muzîk jî balê dikişîne ser xwe. Nexasim jî ji ber ku di tevahiya filma qederê heşt deqîqeyan dirêj de muzîk û efektên profesyonel hene. Gava ez behsa meseleyê ji Emmanuel re dikim dibêje, "Tonî muzîka filmê jî serî heta binî çêkir. Ew kompozîtor e. Wî bi dilxwazî ev karê hanê yê mezin kir, hem muzîk û hem gelek dengên di filmê de hatin bikaranîn, wî çêkirin. Hemû jî bi dilxwazî."

Dbxwazim li Rojava bê nişandan

Teknika filmê pîr xerîb nebe jî gava mirov li filmê dinîhêrî jî bivênevê hin filmên din ên animasyonê dihatin bîra mirovan; yek jî van filma Persepolis bû. Emmanuel jî bo vê dibêje, "Filma Persepolis tesîra xwe weke îlhamê li me kir lê ne tenê ew. Wekî din filma Perwaneh heye ya Îrlandî bi hevpariya Kanada û Luksemburgê. Wê jî îlham da me."

Lê gelo film wê li Rojava bê nişandan yan na? Emmanuel dibêje, menejerek filma wan dişîne festîvalan, ew nîzane gelo film şandina festîvalên filman ên li Rojava û wiha dewam dike: "Li piştta fikra çêkirina filmê doza Rojava hebû û hîna mesele bi dawî nebûye. Ji ber wê em dixwazin film bê nişandan. Ji bo min rûmetek e ku filmê me li Rojava bê nişandan. Ez ê gelekî hez bikim ku bê nişandan." Li ser pîrsa, ka gelo ew amade ye bi Komuna Filman a Rojava re têkiliyê deyne jî ew dibêje, "Belê, çawa! Heke peywendiyê deynin, ez ê bextewer bim. Jixwe em dixwazin film li wir illeh bê nişandan."

Film li derveyî festîvalên filmên Kurdî jî tê nişandan. Li ser vê Emmanuel dibêje, "Filma me hatiye hilbijartin jî bo 15 festîvalan. Di navê de Festîvala Filmên Kurdî ya Berlînê jî heye. Em bi xwe jî ber Covid19'ê nikarin biçin lê filma me çû. Em dixwazin biçin festîvala filmên animasyon a navneteweyî CinAnima ya li Portugalê, lê ka em binîhêrin bê ma em ê karibin; filma me bi xwe diçe, ew jî bo nişandanê hatiye neqandin. Di festîvaleke li Yewnanistanê de jî filma me wê bê nişandan."

Emmanuel niha jî bo şirketeke filmên animasyonê dixebite. Lê projeyên wî yên şexsî jî hene. Ya herî zêde li ber dilê wî, xêzeromanek e: "Ez li ser xêzeromanekê dixebitim. Xêzeromanekê fiksiyon e, xeyalî ye, lê îlhama xwe jî birayê min digire. Jiyana birayê min ê hunermend îlhama senaryoyê ye. Bi vî birayê min re nexweşiya şizofreniyê çêbû. Wekî din projeyê min a filma zarokan a animasyon a bi meymûnan heye, lê ev bi rastî jî hê li destpêkê ye."

Ji bo sîberojê, ez dixwazim jî bo civateke têra xwe mezin û têngîhiştî filman çêkim û bi mijarên têra xwe zehmet yan jî hindikî behsa wan tê kirin, dakevim. Ya li ber dilê min ev e. Ez naxwazim komediyê bikim, yan jî mijarên sivik dakevim ku armanca wan tenê anîna kêfa civatê ye."



* Lîstîka Şanoyê ya Tristan Bernard e ku behsa Berxwedana Kobanê dike. Lîna El Arabî, bi efektên elektrîkê û dengê xwe nişan dide çawa jîneke ku nedixwest şerî bibîne, dibe şervaneke li dijî DAÎŞ'ê. Paytza 2017'an ev şano li Parîsê hat nişandan.

Rojava xwedî bandoreke xurt a dîtbarî ye

Hugo Voisin dibêje, serê pêşî jî ber meraqê ketiye nava projeyê û wiha dewam dike: "Ya rastî zêde agahiya min li ser pîrgirêka Kurd nebû û min piştî xwe bi carekê berda navê, ji ber ku çarenûsa sivîlan û têkoşîna wan tesîr li min kir. Paşê bi xêra hevalên xwe û lêkolîna xwe min çanda Kurdan û Kurdistan nas kirin. Vê filmê kir ku em bi angajman û girîngiya her yekî jî me di nava civakê de bihisin, lê belê her wiha wan kesên anonîm ên ku enerjîya xwe jî bo doza xwe ya heq û lazîm xerc dikin jî em nas bikin."

Hugo Voisin di projeyê de karakter dizayn kirine, yanî rexneya ku dibêje rûyê karakteran rojavayî ye jî para bêhtir li wî vedigere. Lê ew bi rengê ku rexneyê qismî qebûl neke, li ser karê xwe dibêje, "Diviyabû ez karakterên xurt çêkim yê ku bikin ku hisên xurt li cem temaşevanan peyda bibin, lê her wiha karibin nûneriya xelkê wê deverê jî bikin. Ez paşê li ser dekorê û objeyan jî xebitim. Û tevî Marion min cihê xwe di animasyona 2D de jî girt."



Ew dibêje, danûstendineke wan a çandî bi Kurdan re çêbûye û vê jî kiriyê ku proje "bêhtir bi dildariyê" çêbe.

Ez dixwazim bi xelkê Rojava re bixebitim

Ji ber ku gelek wêne û dimenên ji Rojava jî bo amadekirina karê xwe ditine, bandoreke xurt a cografîya û dimenê Rojava lê bûye. Ji ber wê jî dixwaze rojekê biçe Rojava: "Ez ê muhtemelen biçim vê herême. Ji

ber ku bedewiyeke mirovan zêft dike ya deverê heye. Gelekî li mîameleya dîtbarî ya pê re hestiyar bû, ji ber wê jî gelekî îlham da min. Lewma jî bo min wê bibe cihê bexteweriyê ez bi xelkê wir re bidim û bistînim, çanda wir jî nêzîktir ve nas bikim û beriya her tiştî bi xelkê wir re bixebitim."

Hugo niha asîstanê animasyonê ye di beşa storyboardê de; lê li ber xwe daniye ku xêzeromanan çêke. Ew dixwaze mijarên li ber dilê wî, yanî sîberoj û çandî di van xêzeromanan de bi cih bike.

Herçî dekor e henek nîne

Guillaume Montoya derhênerê ku bi layout û rengandinê mijûl bû. Li ser pirsra ka çima wî di vê projeyê de cihê xwe girtiye, ew dibêje, "Esas ez li projeyê 2D digeriya û Emmanuel ez vexwendim. Di dema amadekariyên beriya produksiyonê de me serê xwe bi esasê şerê li Sûriyê û DAÎŞ'ê êşand. Ya rastî pîrr elaqeya min hebû ku êdî ez ji hev derxim ka sedem û koka meselê çi ye. Her ku film bi pêş ket ez lê serwest bûm ku elaqeya min ji bo filmê ne tenê ji bo animasyonê bû."

Erka wî ya sereke di projeyê de çêkirina layoutan, rengandina mekanan, animasyona fx - weke teqandina guleyan, teqîn, dû û wekî din... - û liheviwarkirina wêneyan bûye. Herçî layout in wî li gorî rêûresmê li ser kaxeza animasyonê xêz kirine: "Yanî min sehneya ji bo kamera xêz dikir, ew scan dikir û paşê di photoshopê de ew dikir esasê rengandinê. Ji ber ku ez dildarê senaryoyê bûm, qîsma herî muhîm ji bo min ev bû. Lazim bû ez zûzûka vê biqedînim da ku animatoran bikariya karakteran ji bo kamerayê hazir bikin. Axir ez hez ji awayê ji rêûresmê dikim, lê heger me hemû bi vi rengî çêkîra, wê gelek dema me lê biçûya [dikene]."

Herçî dekor e, êdî li cem wî "henek nînin", vê cî-diya xwe jî ew wîha rave dike: "Wexta em behsa dekorê dikin, êdî henek li cem min nînin. Me lêkolîneke dirêj kir li ser mîmariya Sûri, dikan, avahiyên eskerî, ka YPG çawa li ku bi cih dibe, avahiyên li Kobanê çawa xuya dikin, beriya bombekirinê û piştî şer Kobanê çawa xuya dikir. Ji bo ku em şaş nebin û tam pêlê bikin, diviyabû em asta şerî li gorî kronolojiyê jî hev derxin. Heman tişt jî bo rengandinê jî lazim bû; armanc ew bû em bikin ku hûn tozê, kaosê, qirêjê û xirbeyan his bikin. Ji bo vê, me hem bi firçê, hem bi Photoshopê û hem jî bi liheviwarkirina wêneyan gelek lib û zerre me bikaranîn.

Ji bo em belgeyan peyda bikin em çûn gelek cihan, aktorên referansê jî ji Sûri bûn, gelek jî wan şerê li Kobanê bi çavan ditibû, wan karî jî me re bibêjin, ka li wir rewş çawa bû. Armanca me ew bû em têra xwe otantik bin, lê ne zêde. Ji ber ku ez tercîh dikim Kobanê ya xwe xêz bikim. Jixwe, ya ku di sinemayê de ez hez jî dikim ev e: mirov bike ku xelk bifikire ev devereke e, lê film li cihêkî din hatibe çêkirin. Lê ev sinema ye.

Em çûn Înstîtuya Kurd jî li Parisê. Me xwe gihand belgeyên wêneyî. Me pirs jî xwendekarên doktorayê kirin. Jixwe xwendekarekî behsa şerê li Sûri kir jî me re, Şîi, Sunî, DAÎŞ û wekî din. Piştî me xwe gihand 3 aktorên jêhatiyên Kurd, wan jî karî bêhtir detayan jî me re rave bikin. Wexta ez li ser projeyê şuxilim, ez pê hesiyam gelek kes jî li derdora min hene ku bi xwe jî Sûri ne, yek jî van jî muzisyenêk bû. Ji ber ku ez jî muzikjen im, vê yekê em nêzî hev kirin. Di vê projeyê de ez bi tişteki hesiyam; Kurd ecêb dostane ne û qenctir in. Û erê ez hez dikim careke din bi wan re kar bikim."

Nişandana filmê li Rojava bi dilê wî ye, "Çûna Rojava jî bo nişandana filmê wê ya herî baş be. Ji ber ku yên di nava meselê de ew in. Min dixwest reaksiyona wan ên di nava meseleyê de jî bibînim. Lê bawer nakim, ev bibe, jî ber ku ez ne dostekî seferên bi balefirê me!"

Ew niha li ser adaptasyona animasyonê ya xêzromana "Usagi Yojimbo" dixebite li Gaumont Animationê û li wir ew resmên mekana xêz dike.



- Me lêkolîneke dirêj kir li ser mîmariya Sûri, dikan, avahiyên eskerî, ka YPG çawa li ku bi cih dibe, avahiyên li Kobanê çawa xuya dikin, beriya bombekirinê û piştî şer Kobanê çawa xuya dikir.

Li ser çi ye?

Kurtefilma animasyon Rojava li ser fermandara YPJ'ê Rihanê ye. Rojava bi xêzên xwe û rengandinê besît û bi animasyona xwe Persepolisê hinekî tîne bîra mirovan. Film li ser fermandar Rihanê ye ku ji ber şervaniya bavê xwe dilgiran e. Lê gava bavê wê şehîd dibe, ew şûna wî digire û di şerê li diji DAÎŞ'ê de li Kobanê fermandariya yekineyêke YPJ'ê dike. Di filmê de keliyên hêdî yên hizran derdikevin pêş û ev yek derfetê dide temaşekeran ku hem li bedewiya dîtbariyê binihêrin di heman demê de peywendiya wê bi rastiya li Kurdistanê re deynin. Ji ber ku gotin bi qasî dimen li pêş e, estetîka filmê jî bi qasî dimen, metn diyar dike.

Rêbaza ku di dimen de karaktera Rihan û ya bavê wê zelûl dike û dike ku temaşeker keliyekê diduyan nizanibe ka niha li kê temaşeker dike, hestên destpêkê yên Rihanê beramberî bavê wê çêtir didin fêmkirin. Temaşeker di qederê heşt deqîqeyan de bi estetîka muzîkê ya li wê zêdekirî wê şahidiya vê yekê bike. Muzîkjen Artyom Minasyan û Ruşen Filiztek bi kompozîtoriya Tonî vê yekê misoger dikin.

Anîmasyon û lîstikvanî



Anîmator him nivîskar him derhêner him jî lîstikvan e. Çirokê dinivîse, diyalogan çêdike, bi ser de jî dîmenan yek bi yek ava dike, paşê mijar çî be, êdî karaktera xwe dixwe nav tevgerê (acting).

Belê, anîmasyon û lîstikvanî. Belkî hûn ê bêjin çî elaqe? Her tim dibêjim, û wa ez ê disa bêjim, her tişt bi hev ve girêdayî ye, mîna her parçeyên ku gerdûnê temam dike. Lîstikvan insan e, tabî û parçeyekî xwezayê ye, xwediyê xweza û karakterekê ye û bi her tiştî re elaqayeke xwe heye. Ma ne di anîmasyonê de karakter tine ye, ka em çîma li ser lîstikvanîyê bixafînin? Di anîmasyonê de tu bi lîstikvanîyê [aktoriyê] nizanîbî tu yê 'karakter' çawa biafirîni? Xuyê min e, ez yekser dikevim nav meselê, ne hewce ye behsa wê bikim ka anîmasyonê çawa dest pê kir filan û bêvan, ez hema yekser bêm ser mijara xwe ya 'lîstikvanîyê'.


Anîmatorên ku anîmasyonan çêdikin li ser kompûter, iPad û bi bernamêyên anîmasyonan, çawa ku ji bo filmên anîmasyonan ava bikin, hewce ye him bi niviskariyê, him bi derhêneriyê zanibe, gerek haya wê ji lîstikvanîyê jî hebe û pê zanibe.

Ma xeyalên me dikare bike paket?

Helbet ev kar her çîqas teknîkî be, mîna qalibekî xuya bike jî programên kompûteran nikarin xeyalên me mîna paket bine deyne ber me. Belê qalib hene, lê tu yê wan qaliban çawa biafirîni, ha ew di destê hunermendê/anîmatorê de ye, afirînerî ew e.

Dibe lîstikvan jî

Anîmator him nivîskar him derhêner him jî lîstikvan



Berri SHEMDIN

her replîk, dialog, gotinên rolê, karakter deşîfre dike) dixwaze ew fêhm bike, nas bike ku li ser laşê xwe, dengê xwe, hest û hişê xwe 'karakter' biafirîne û bi provayan 'acting' bike. Heman tişt jî bo anîmator jî hewce ye. Çawa lîstikvan, dema karaktera xwe bi pirsan analiz dike: Kî ye? Çend salî ye? Li ku dijî? Çî karî dike? Kesek çawa ye? Rîtm laşê wê çawa ye? Têvger û xuyên wê çawa ne?... hwd. Anîmator divê bi detayan hemûyan jî zanibe. Di lîstikvanîyê de karakter çawa him fizîkî û hest him bi detayan analiz dikin, bi amûran lîstikvanî diafirînin, di anîmasyonê de jî li ser karaktera ku me xêz kiriyê ew tişt ava dibe.

Niha xiçek jî, em bikevin nav detayên lîstikvanîyê, lê metirsîn, ez behsa teknîkên lîstikvanîyê

e. Çirokê dinivîse, diyalogan çêdike, bi ser de jî dîmenan yek bi yek ava dike, paşê mijar çî be, êdî karaktera xwe dixwe nav tevgerê (acting). Ha wê kêliyê ew

dibe lîstikvan jî, ger anîmator bi lîstikvanîyê nizanibe ew ê karaktera xwe çawa çêke? Mesele ne tenê xêz e, inşakirina karakterên anîmasyonê ye. Bila insanek, ajalek an karaktereke fantasîk be, ferq nake, ger ew karakter be, xwediyê laş, form, sekn, enerjî, hest, xuy e.

Di lîstikvanîyê de çawa lîstikvan li ser rola xwe dixebite, ji bo karaktera ku bilize li ser wê difikire, li ser lêkolînan dike (li ser

yên Stanislavkî, Grotowski, Micheal Chekov, Lee Strasberg-Stella Adler, Teknika Meisner, Lacan.... an filan bêvanan nekim. Ez ê bi rêya herî sivik qîse bikim ku xwendevanên derheqê lîstikvanîyê de bi tu tiştî nizanin jî jixwe destpê bikin, ji xwezaya xwe, li xwe mêze bikin û karakterê fêhm bikin.

Destpêka astengkirina

laş û qutkirina azadiyê

Li ser terîfa "hawîrdorê/ekolojiyê", teoriyên Murray Bookchin ên gelekî xurt hene. Elaqeya wî bi lîstikvanîyê re tine helbet, teorişyên anarşîst bû lê elaqeya lîstikvan bi anarşîzmê re heye, ka bisekinin, ez ê bêjim çawa heye.

Madem mesela me lîstikvanî ye, hewce ye ku haya me ji xwezaya karakter hebe. Erê, lê çî elaqeya anarşîzmê heye? Çawa nîne heyran? Dêrdê anarşîzmê herî mezin ne "AZADÎ" ye, ên din; pirs-girêka desthilatdarî, hiyerarşî.... Ji bo jiyaneke azad e. Ê anîmator di mala xwe de rûdine û anîmasyonan çêdike, azadî ne pirs-girêka wî/wê ye? Ha vê kêliye em ê bi terîfa Murray Bookchin ber xwe bibînin.

Di pirtûka wî ya Azadiya Ekolojiyê de "xweza" yê awa tarif dike; Xwezaya Yekemîn û Xwezaya Duyemîn. Xwezaya yekemîn a fizîkî; li derve em çî bibînin dar, çûçik, civak, çand, dinya gerdûn. Têvgerên derveyî me tev di nava xwezaya yekemîn de ne. Xwezaya duyemîn; hundirê me, ruhê me, janên me, tiştên ku em hîn bûne, sistem û dewletan li me ferz kirine. Ji taybetmendîya tehma devê me heta bi tiştên ku em jê kêf digirin li gor her kesî tewş lê ji bo we ya herî xweş e, yanê karaktera we, mîzaca we, rengê we yê şexsî ye. Çîqas xweş e ne werê?

Xwezaya Duyemîn, dengê dilê me ye. Lê ji bela sistemên weş, rengê xwe ji bîr kiriyê û em jî bûne mîna her kesî. Ez vê jî nebejîm ezê bite-qîm, di vê pirtûkê de dema behsa xwezaya insan dike, Bookchin dibêje (bi şorên min); hunermend; kesên ku ruhê xwe teslîmî vê pergale nekirî ne, xwezaya wan pîrr xurt e û "normal" nebûne û her dem dikin. Dibêje, heta niha komînîst û çepgir hunermend dîn, dijraber dihesibandin, ji ber ku qanûnên ku wan danibûn di nav partiyên xwe de ji rabûn û rûniştinê heta bi forma axaftinê jî diyar kiriyê û dixwestin her kes mîna wan be. Rexne dike û piştî dide hunermend û dibêje, her mirov a rast awa ye, lê ên xwezaya xwe, taybetmendiyên xwe, hestên xwe teslîm nekirine, neketine nav "normal/piraniyan" man û ên "normal" bûn jî afirîneriya xwe winda kirin. Li gorî min dema mirov wekî klîşe timî bibêje 'hunermend ne normal e' rîska xwe jî heye. Nexwe, zexelekî pîsik derkeve ku jî xwezayê fêr nekiribe, ew ê jî mafê ti kesî re rêzê negire û li ser navê hunermendiyê dîniya xwe dijraberiya xwe bike maske, çî bê ber devê xwe bibêje, dijûnan bike, zirarê li jinan - nexasim mêrên hunermend, nivîskar vê bi kar tînin - bike, raşehitbûna xwe, qelsiyên xwe, nexweşiyên xwe, xirabiyên xwe bike. Paşê jî navê wan tiştan deyne, dijrabertî. Halbûkî di xwezayê de heqxiwarin tine, ne hewce ye em behsa wê jî bikin, zarok jî dizanin, azadî ne temne ew tişt e dilê te çî bixwaze tu wê bikî. Ger awa be, here xwe bike kuncikek çî dixwazî bike lê azadiya kesî neperçiqîne. Mirov sosyal e û madem parçeyê xwezayê ye, eynî mîna di gerdûnê de çî hebe bi hev re têkildar e, mirov jî awa, tena serê xwe nîne û bi derdora xwe timan dibe. Em giş parçeyên xwezayê ne, rengê in. Her kes xwediyê rengê ye. Em yanê, ev rengên şexsan kesan civak, çand, netewe, ser axa xwe

dibin yek reng lê nava vî rengî, rengorengo ye û her rengê şexsan karakteran çand, netewe, xweza bi xeletan bi hev ve girêdayî ne û em insan, heywan, dar, kulîlk, stêrk û gerdûnê timam dikin. Mijarê ez hinekî teng bikim û jî ser xwezayê bînim ser laşî. Û beşa feylezofiyê bila ji me ra bibe rê, malûm e, min gotibû her tişt bi hev ve girêdayî û her tişt bi insan ve girêdayî ye û helbet bi listikvan ve jî.

Sinor û laş

Feylozof Michel Faoucoult di pirtûka xwe ya "Zayîna Girtigeh"ê de behs dike ka desthilatan çawa laşê bi "Dîwarên Desthilat"an dike tangekê, terbiye dike. Em fêr dikin ka desthilatdaran bi sinorên xwe dîwarên xwe bi girtigehan, dibistanan, nexweşxaneyan bi sazîyên xwe çawa insanan, laşê insanan, sinorê laşê insanan çawa li gorî qanûnên xwe sinordar kirine.

Spînoza jî li ser laş analîzeke gelekî xweş dike, di Etîka da ew dibêje, "Sinorên laş jî hîşmendî/zêhn berfirehtir e". Spînoza bi vê gotina xwe, behsa hîşmendiyê dike ka tiştên ku em hîn dibin, bi me dane hînkirin çawa laşê me dike nav sinorekî. Pîrrî caran hîn me hereketek ne ceribandîye yan em yekser ditirsîn, yan jî yekser qebûl dikin ku em nikarin vê bikin.

Min çîma behsa wan feylozofan kir? Da ku em hinekî meseleya xwezayê, sebebên astengîya li ber azadiyê, azadiya laş fêr bikin. Dema em vê ferq bikin, hingî em ê veegerin ser lêgerina xwezaya xwe, karibin bibin xwe, bi laşekî azad, hişekî jî desthilatdaran rizgarbûyî. Hingê, afirînerî jî wê bikevê dewrê. Têkiliya azadî û afirîneriyê heye. Ger laşê te azad nebe, ne tenê bi maneya fizîka insan, civaka ku em pê re dijîn, mekanê ku em tê de ne, welatê me azad e an bîndest e, ew giş parçeyê wê ne. Nexwe, hingî hiş jî di bin bandora desthilatdaran de ye ku Spînoza jî behsa wê dike. Azad nebe

hiş û laşê listikvan, listikvanî jî wê bi sinor be, animator azad nebe, hêza xeyalên xwe wê nikaribe bi animasyonê li gorî dilê xwe biafirîne û ew ê di nav qalibên heyî de bimîne.

Me gotibû animator gerek jî listikvanîyê fêr bike û me bi çend feylozofan behsa azadiya laş kir, ev aliyê teoriyê bû ku em pîrsgirêkan tesbît bikin. Niha em bîr ser aliyê pratîk. Animator çawa dibe listikvan? Li jor min gotibû, animator him nivîskar e, him derhêner e, him jî listikvan e. Dema karaktera xwe diafirîne hewce ye, mîna listikvan ku çawa ji laş, deng û hestên xwe karakter diafirîne, animator jî heman tiştan hewce ye, zanibe. A rast karê animator jî karê listikvanî zehmettir e. Bira jî karê animatorî pîrr zor e. Di demên dawî de di vî warî de tecrûbeyeke min jî çêbû, dema koronayê min dest bi animasyonê kir, li ser appan, min got madem ez nikarim bileyzim, ez karîm karakteran çêkim, animasyonêkê çêkim, min hingî jî dit karê animatoriye çendî zehmet e. Di listikvanîyê de, beden jî xwe hereket dike, moment [kêlî] hingî jî 'împulsiv [bi dijwarî]' derdikevê holê, lê animator hewce ye jî her tevgerê bi hemû guhertinê - bi dem û tevger - haydar be û bi kar bîne. Di her tevgera karakterê de hewce ye jî tayê porê karakter heta lîngen laşê karakter baş zanibe, rûyê karakter li gorî hestên karakter, xuyê karakter her 'dem'ê baş zanibe da ku çêke.

Halê notr

Tîyoyek jî listikvanîyê bidim, ji bo animasyonê (di çêkirina karakteran de). Dema we karaktera xwe çêkir pêşî halê wê ye notr çêkin. Di vî halî de bila bi vê wêneya notr, temaşevan zûka wê nas bike û bawer bike. Ji emrê wê bigirin heta karê wê, çîn, xuy, sûret, sekn wê karakter diyar bibe. A rast, di serî de mîna stok karakter form bidî pê, piştî wî edî di her hareketê de ew ê li gorî tîpa xwe bimeşe, bikene, pal dide, baz dide.. hwd. Ger hûn jî



Minakek ji poza notr

karakter a xwe bi halê notr hez bikin, temaşevan jî wê hêz jê bike.

Gere temaşevan baweriyê pê bîne

Dem a we halê notr çareser kir û jî hereketên laşê eynî mîna listikvanekî baş bi kar bîne, hingî temaşevan wê bawer bike. Helbet temaşevan zane ev ne rast e, eynî mîna şanoyê, lê ev bawerî nebe ewê îlûzyon jî nebe û temaşevan ger bawerî bi listikvan, karakter a ku we ava kiriyê neanibe ew ê jî çirokê jî bawer neke, empatiyê jî bi karakter a ku xeber dide, neke. Bila karakterek surreal, fantastîk be, dîsa hewce ye temaşevan jê bawer bike.

Dem a we karakter ava kir û ew karakter xwediyê rîtmekê be, xwediyê hestan be, xwediyê stîla laşekî be, xwediyê hereketên rû dînamîk be û bi tevgera karakter be, hingê dibe listikvanekî serketî û temaşevan zûka wê karakter a animasyonê çî be jî insan, ajal, heta xêzek an xeletê be jî temaşevan wê enerjîya xêz xeletê jî his bike.


Animatorên îro diçin dersa listikvanîyê distînin, helbet ne ji bo sehnê jî bo "movement [tevgerê]" çêtir fêr bikin, bibînin û di laşê wan de guhertineke çawa çêdibe, nas bikin û hingî wê xweşîk fêr bibin ka karakterên xweş û pêbawer çawa mirov dikare çêke.

Hûn jî listikvan in

Him dem a mirov laşê xwe nas bike, ew tîkiliya hest jî xurtir dibe. Laş û hest jî cuda ne, lê yek in. Yek qels be ya dîn jî qels dibe. Mîna xwezayê bi hev ve girêdayî ne. Laş û hest ne tenê jî bo listikvanan girîng in û ne hewce ye vê bêjîm, a rast hûn jî tîra xwe listikvan in ha, di nav jiyana xwe de.



Dî çêkirina animasyonê de ceribandîneke tevgera laşî



Li ser wêjeya devkî li Bohta û Hekariya



► Lokman TURGUT

Ji ber ku gelek caran gava behsa devkîbûnê, folklorê, kilam, stran û dengbêjiyê tê kirin, mirov li nexwendeyan, li wan kes û civakên ku nivîs neditine, tesira wê kêma li wan bûye difikirin, lazim e ez wê gotinê bibêjim: Li Kurdistanê îro ji û ji sedsalan û vir ve jî civak nivîsê nas dike û bi kar tîne. Yanî ew civaka Goody jê re dibêje "truly oral" li Kurdistanê jî dema ku em bi navê wê dizanin û vir ve çênebûye*. Jixwe ew reşbelek û mektûbên di stran û kilaman de navê wan tê hildan jî şahidên wê ne. Civak bi ferdên xwe hemûyan xwende nebe jî, haya hemûyan jî nivîsê û tesîrên wê hebûye. Heta li Kurdistanê jî mên û xwendebûneke bi gelek alfabayên heye: Erebi û Kurmancî/Soraniya Medreseyan, zimanên fermî yên dewletên dagirker (Tirkî, Erebi, Farsi) û Kurmanciya bi tipên latîni li Rojava û Soraniya bi tipên Arami/Erebi li Başûr. Ji ber wê jî devkîbûn nabe ku weke dijberê xwendebûn yan jî nivîsê bê dîtî. Bi heman hizrê, nabe ku wêjeya devkî jî dijberê yan jî nebûna wêjeya nivîskî bê dîtî. Ji ber wê jî weke kategoriyeke bi sînorên diyar ji hevveqetandinê û diyarkirina sînorên devkîbûnê jî wê ne di cih de be. Hem devkîbûn û hem jî nivîskîbûn fenomenên civakî yên welê tevlihev û girift in ku nikarin ji hev hema welê karibin îzolekirin. Lewma reduksiyonizmeke bi vî rengî wê nehêle ku çandeke devkî yan jî alî û xwedanewera wê bi rastî bîn fêmkirin. Ji ber wê jî terîfeke meydana devkîbûnê ya giştî dikare weke "dîmensiyon û xwezaya ragihandin û danûstandina bi axaftinê" be, beramberî meydana nivîskîbûnê ku dikare weke "dîmensiyon û xwezaya bikaranîna nivîsê" be.

Di çanda devkî ya komeke diyar de û di pêvajoyên wê yên kognitif (bi aqil têgihîştin) de devkîbûn faktoreke girîng e û xweserî çandê ye. Ji ber wê, ew ê ne şaş be mirov bibêje, ji bo fêmkirina devkîbûna komekê pêşî lazim e mirov bikaranîna zimên û cûreyên wê yên devkî yên muhim ên di ragihandinê de tîn bikaranîn, ji hev bîn derxistin. Ji bo bibe xurtiyek jî fêmkirina wêjeya devkî ya Kurdan, min hewl da cûreyên wêjeya devkî li herêmên Bohta û Hekariyayê jî hev derêxim, nas bikim ka ew çawa hatine sinifandin.

Gava min mîamele bi metnên devkî re kir jî performans jî bo min a kilîta esasî ya mîamele û çanda insanan bû. Performans di vî peywendê de axaftina (speech act) a pirralî ye ku ne tenê girêdayî hawîrdora xwe ya taybet e, lê belê gelek peywendiyên wê yên komunikatif (ên ragihandinê) bi performansên beriya xwe û piştî xwe re jî hene**.

Di helwêsteke bi vî rengî ya beramberî wêjeya

devkî de cûre û sinifandinên cihî gelekî muhim dibin û cûre weke faktoreke organizeker a performans devkî ya bi gotinê tê dîtî. Ji ber wê bikaranîna binavkirinê cûreyên gelekî belav ên weke efsane, destan û çîrok wê jî bo lêkolîneke cûreyên devkî li mekanekî çandî yê diyar wê zêde bi kêr neyên. Ji ber wê jî maqûl e mirov sinifandina cihî fêmkirî, terîf bike û bi nav bike.

Ji gelek terîfên cûre, ez bi xwe cûre weke şertûmercên sereke yên çarçoveyî dibînim, yên ku dirokî hatine neqilandin û nisbî jî tîra xwe bi îstiqrar in. Ev şert û mercên sereke yên çarçoveyî jî bo diyarkirina berê hilberinê û diskursa jî bo hilberinê ye. Ew gelekî stillizekirinê û xwe dispêrin pratikên civakî yên hilberina zimani û lihevkarîna li ser wê ya di nava civakê de. Lê belê ew dîsa jî qayışokî ne û li guhertinê hilberîner ên bi performansan jî vekirî ne.

Ji ber wê, dabeşkirina cûreyên wêjeya devkî li gorî sinifandina di nava civaka ku ev wêjeyê de tê hilberinê û gotin, gelekî maqûltir diyar e, lewma ev dabeşkirin ne hema welê ye, li gorî hin qaîdeyan e û li aliyê din dike ku em rehetîr li seridina wan cûreyan serwest bibin. Li gorî wê li herêma Bohta û Hekariya hin jî cûreyên wêjeya devkî yên sereke ev in:

Stran

Stran cûreyê di nava wêjeya devkî ya Kurdî de herî belav e. Ew hem cûreyekî muzîkî û hem jî cûreyekî wêjeyî ye. Gava ku Celadet Bedirxan, ew weke "le genre exclusivement musical, correspondant à peu près au Lied allemand (cûreyê bi temamî muzîkî ku hema hema teqabîlî Lied a Elman dike)" (Bedir Khan 1932: 10) bi nav dikir, terîfeke di cih de dikir.

Axir stran li ser bûyereke bi rastî yan jî fiktîf ava dibin. Di warê mijara xwe de sînorekî wê yê diyar xuya nake. Melodiya diyar a muzîkî xisleta stranê ya sereke ye ku wê jî cûreyên din ên bi heman mijaran cihê dike.

Serhatî û qewl

Serhatî esas cûreyên peşanê yên devkî terîf dike. Jixwe maneya wê îşaret bi îştî bi ser kesî de hatî dike. Herçî eşîrên koçer ên weke Kîça ne, li şûna serhatî, qewl jî dibêjin, lê qewl xwedî peywendekê cihê ne jî. Lê belê qewl bi erkeke civakî jî radibin, ew hin tecrûbe, zanetî, rêûresmên eşîrî, rituel û cihê civakî yên tebeqeyên diyar neqil dikin.

Peywenda civakî ya ku qewl wê fonksiyona xwe bi cih tînin, îro êdî nemaye, yan jî hema hema nemaye. Lê di pratîkê de gotina Serhatîyan bi giştî jî ji ber ku yekser elaqedarî civakî jî rêûresmê ye, ji nava cûreyên deverê yên herî kêma tîn gotin in û bi gotineke din, yên herî zêde li ber nemanê ne. Em gotina ami bi kar

- Hem devkîbûn û hem jî nivîskîbûn fenomenên civakî yên welê tevlihev û girift in ku nikarin ji hev hema welê karibin îzolekirin. Ji ber wê jî terîfeke meydana devkîbûnê ya giştî dikare weke "dîmensiyon û xwezaya ragihandin û danûstandina bi axaftinê" be, beramberî meydana nivîskîbûnê ku dikare weke "dîmensiyon û xwezaya bikaranîna nivîsê" be.

bînin: "Modernîzm" herî zêde li vî cûreyê wêjeya devkî hatiye xezabê.

Payizok

Ev cûreyê hanê ku weke payizok (payizok, pehizok û hwd.) tê binavkirin, ne cûreyek e ku bi tenê bi payizê karibe were terîfkirin. Ev cûre li herêmên Bohta û Hekariya (qismî li Behdînanê) belav e û nexasim jî di nava koçeran de yek jî cûreyên wêjeya devkî yên herî xurt e.

Dema em berê xwe didin cûreyên nêzi hev ên wêjeyî yên ku payizok jî yek ji wan e, em dibînin ku hemû di heman demê de cûreyên muzîkî ne, û nêza û melodiya wan di îcrakirina wan de diyarker e. Yanî, dema em berê xwe bidin van cûreyan, nabe ku em aliyê muzîkê yê van cûreyan jî bîr bikin. Yek ji van cûreyan **xizemok** e, yê din jî **biharok** e.

Êdî mijar di payizokê de çî dibe bila bibe, em tê de hin ferdayên (qismek jî helbesta devkî) ku behsa payizê û dinya payizê bikin, dibînin; ev jî mirovan melan-kolîk dikin û didin ponijîn. Alegoriya di navbera payizê û dawîya temenê mirovan de dike ku mijarên payizokan gelek bûyerên dramatik bihewînin.

Heyranok

Heyranok bi şiklê xwe yê pêkahatinê duet in. Dueta du evindaran yan jî di navbera aşîq û maşûqekî de ku maşûq timî ne miqabîlê dil e. Keç û kur li hev vedigerînin. Lê belê ew sînorê destpêkê yê naverokê, jî mîj qulqulî bûye.

Ji ber ku rêûresma nihurandina heyranokan li zozanan yan jî li gundan êdî nemaye, heyranokên berdest, pirranî jî ber melodiya xwe ya xweş li dîwanan û odeyan tîn gotin.

Hayîn û Şîni

Hayîn û Şîni du cûreyên wek cêwiyên in. Herçi hayîn in, li deverên din teqabilî landik, lorîkan dikin, zêmara Torê û beriya Mêrdînê jî teqabilî şîniyan dikin. Herçi hayîn in, tenê jin wan dilorînin. Şîni bi xwe jî weke zêmaran di şert û mercên "asayî" de jin wan dibêjin. Lê belê naverok û gelek qalibên helbestwarî (formul) di herdu cûreyan de eynî ne. Weke encam mirov dikare bibêje, ji ber ku di civaka jî rêûresmê de jin êş û azara jî ber çûna nav maleke xerîb (dana mêr), yan jî jî ber mirinê nekarî hema jî xelkê re bibêje, lê dikarî binihûrîne, em dibînin ku naveroka van herdu cûreyan gelekî dişibe hev, lê her wiha qalib û melodiyên wan jî. Nihurandina êşê jî ber vê terîfa herî giştî ya van cûreyan e. Yanî hem di hayînan de û hem jî di şîniyan de nihurandin jî bo jî heqî êşê derketinê, rêyek in yan jî rêyek bûne.

Li ser rewşa giştî ya cûreyan li van deveran

Di dawiyê de li ser mijara cûreyên devkî li herêmên Bohta û Hekariya mirov dikare bibêje, diyar e ku îcraker bi qaîdeyên sereke yên cûreyên girîng baş dizanin; ew li gorî van qaîdeyan performansên xwe icra dikin. Ji bo berhemên xwe terîf û bi nav bikin, li ber destê wan terminolojîyeke cihî heye û ev terminolojî di cihê xwe de û baş tê bikaranîn. Cûreyên bi stranî û yên peşxanî hemû jî xwedî heman qîmetî ne. Lê belê cihê du cûreyan hinekî taybet e jî, ne jî ber ku bo îmtiyazên wan hene, lê jî ber ku jî bo binavkirina awayê sereke yê cûreyan terîf dikin. Stran û serhatî jî bo jîhevderxistina cûreyên muzîkal û peşxanê tîk bikaranîn.

Li vê herêmê hin cûre edî hatine ber nemanê, jî ber ku ew hem her diçe kêmtir tîk hilberin, hem jî kêmtir tîk îcrakirin. Sedema sereke, şertûmercên hilberîna wan edî neman; tevî ku hin cûre jî ber esteika xwe dişa jî tîk îcrakirin, jî bo hin cûreyan derfet û sedemên îcrakirinê diyar e namînin.

Analîzeke giştî ya berheman

Gava em berê xwe bidin berhemên van cûreyan, em dikarin bibêjin ku berhemên li ser kesayet û bûyerên dirokî me di warê wan de baş agahdar dikin û dikin ku em hayilbûna li dirokê ya civaka jî rêûresmê ya van deveran çêtir fêm bikin.

Li ser Bedirxan Begê jî cûreyên cihê gelek berhem hene. Ew behsa salên 30'î, 40'î yên sedsala 19'an dikin.

Mesela yek jî stranan, behsa Seid Begê, Mirê Êzîdxanê dike. Em li vir şahidiyê li êrişa Bedirxan Begê li dijî Kela Ridwanê dikin. Mirov dikare gelek spekulasyonan bike li ser sedemên êrişa Bedirxan Begê ya li dijî Seid Begê, lê tiştê heye ku weke heyva li çardehan diyar e: Ji bo Bedirxan Begê hingê çiqas mir û begên xurt kêm bûna, desthilata wî jî ewqas zexm dibû. Bedirxan Begê sala 1836'an weke mir li şûna apê xwe Mir Sévdîn, hat diyarkirin. Yê ku ew kir mir jî ne xelkê Bohta bû, lê Paşayê Osmanî Reşîd Paşa bû. Bila li vir agahiyek be, Êzdîn Şêr Beg kurê Mir Sévdîn e, yanî mirê li gorî hiqûqa miraniyê ew e. Bedirxan Begê bi wekalet mirîtiya Bohta dikir û jî bo ku cihê xwe zexm bike jî ew bi imperatoriye re yanî bi Bab-i Alî re dibe hevkar, bi gotinên wî bi xwe, dibe xizmetkarê Bab-i Alî. Ji ber wê jî wê ne şaş be em bibêjin ku di sefera Osmanîyan a li dijî Kela Seid Begê (Kela Ridwan), Bedirxan Beg bi artêşa Osmanîyan re şerê Êzîdxan kiribe. Ew sefera ku Helmut von Moltke, efsere Prusayê yê sêwirîmendê artêşa Osmanîyan behsa wê dike, Gulana 1838'an qewimiye.

Şikestina Bedirxan Begê

Qewlek yekser bi şikestina Bedirxan Begê dadikeve. Di qewlî de sedema sereke ya şikestina Bedirxan Begê weke "xiyaneta" Êzdîn Şêr Beg tê nîşandan,




lê bi nakokiyên paşê ev yek zelûl dibe. Lewma ev xiyaneta hanê tenê jî bo dema şer e, û bi ser halan de Êzdîn Şêr Beg weke mirê Bohta tê binavkirin. Çawa me li jor bi bir xistibû, jixwe li gorî qanûnên mîrtiyê, ew mir bû û Bedirxan Begê bi wekaletî mîrtî dikir. Ji ber wê jî gelekî muhtemel e ku îcrakeran pêre pêre, paşê ev fikra xiyanetê jî ber diskursên neteweyî yên di nava Kurdan de li performansa xwe zêde kiribe. Em awira xwe li îro, di nava neteweperestiya Kurd de deynin, "xiyaneta" Êzdîn Şêr Beg li milletê Kurd bûye. Lê gava em li meseleya hingê dinihêrin, em dibînin, Êzdîn Şêr Beg heman tiştê ku Bedirxan Begê jî bo bibe mir kirî, li Bedirxan Begê kiriyê: Yanî hevkarî bi Osmanîyan re kiriyê. Lê di navbera wan de cudahiyeke jî heye. Êzdîn Şêr Beg li gorî qanûnên mîrtiyê mirê heq e, Bedirxan Beg bixwe li ser vî heqî rûdine. Em di van berhemên de wekî din dibînin ku Bedirxan Beg mirê Kurmanciyê jî be, ti nîşana hewldanên mîletgîriyeke modern pê re xuya nakin. Ji ber wê jî ew çend hewldanên ku behsa wan jî tê kirin, dibe ku paşê pêre pêre li metna van berhemên hatibe zêdekirin.

Cil û bergên Bedirxan Begê li gorî Miner Killbourne Kellogu. Killbourne Kellogu wextekê dibe qasidê Wezaretê Karê Derve ya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê. Muhtemel e ku ev resmê hanê jî hingê xêz kiribe.

► Êzdîn Şêr Beg li gorî qanûnên mîrtiyê mirê heq e. Em di berhemên wêjeya devkî de Bedirxan Begê weke mirê Kurmanciyê dibînin jî, ti nîşana hewldanên mîletgîriyeke modern pê re xuya nakin. Ji ber wê jî ew çend hewldanên ku behsa wan jî tê kirin, dibe ku paşê pêre pêre li metna van berhemên hatibe zêdekirin.



Herçî qafiyê ye, mirov ne di berheman hemûyan de dibîne. Dîsa jî çavdêrekî baş qafiyeyeke kompleks û girift a nava rîstan di çih de dibîne. Ji bilî beytan, wezneke helbesta klasîk bi ti awayî nîne. Herçî awayê îcrakirina muzîkal e, ew jî bi dirêjahiya rîstan diyar dibe.



Huneremenda Fransî Laura Tietjens ev resmê dengbêjekî xêz kirîye. Wê ew li Amedê li mala dengbêjan nas kirîye.

Bêbextî eşq û namûs

Eşq bi gelek aliyên xwe yên çihê jî mijarên sereke yên gelek çûreyan e.

Di trajediya Şêxik de em hem eşqê, hem bêbextiyê, hem şer û hem mefhûma namûsê dibînin. Payizoka bi navê Şêxik behsa neçirvanê kewan ê mirê Gurkêlê dike. Ji ber ku Şêxik pîr lihevhatî ye, jina mirî Gulê, rojke mir li diwana Mirê Bohta ye, wî neçar dike ku pê re be. Xulamên mir xwe digihînin diwana Mirê Bohta û jî mirê xwe re bi şîfre, dibêjin ka çi qewimiye. Mir vedigere Gurkêlê û Şêxikî bi êşkenceyê neçar dike ku li xwe mikur bê. Fermana kuştina wî jî ne ji rêzê ye. Ew tê berdan û gava bi soberiyê jî çemî dibihure, eskerê mirî yê "fileh" bi fermana mirî wî bi tivîngê dike. Li gorî serhatibê û payizokbêjan, mir bi xwe jî ber ku bêriya Şêxik kiriyê ev payizok gotiyê. Lê çarenûsa Gulê çi bûye, em nizanin, weke ku yekane mexdûr Şêxik be payizok û serhatî hatine séwirandin. Bi wî halê xwe jî ev trajediya Şêxik tenê ye.

Eşq, namûs û mirin

Herçî namûs e, çawa ku jî aliyê komên civakî yên jî malbatê mezintir tê avakirin, zexta wê ya ber bi cezakarîyê ve diajo, li ser malbatê bi xurtî xwe dide hîskirin.

Di stranê de ku Mihemed Evdilqadirê Ripinî dibêje*** jinek e, ya ku dinihurîne. Ew dibêje, evindarê wê hatiye kuştin. Stran pîr kevin nîne. Muhtemel e ku di salên 1960'î de bûyer qewimîbe. Lê axir jî ber "bela namûsê" kurik tê kuştin. Kurik jî jî malê ye. Bi qasî ku diyar dibe, endamên din ên malbatê didin dût şopa wî, wî li Stenbolê dibînin û dikujin.

Ev strana jinê bi xwe bi vî berheman hemûyan neşandana xurtiya li dijî malbata xwe bixwe; belkî jî bi rengekî jî rengan tola xwe hiltîne.

Aliyên hunerî yên performansê

Mirov dikare kurt û Kurmancî aliyên hunerî yên performansa wiha terîf bike:

Herçî ferda ne, ew bi navberan zelal diyarkirî ne; hêmanên ku ferdayan didin destpêkirin, diyar in. Wekî din jî bo ifadekirina hestên xurt jî qalibên diyar hene. Hin berhem bi ferdayên diyaloga di navbera du jinan de dest pê dikin. Ev herdu jin dibe ku bi rastî jî bin, dibe ku xeyalî jî bin; lê axir ew çavdêrên meseleyê ne û bi gotinên wan mesele tê gotin.

Herçî qafiyê ye, mirov ne di berheman hemûyan de dibîne. Dîsa jî çavdêrekî baş qafiyeyeke kompleks û girift a nava rîstan di çih de dibîne. Wezneke helbesta klasîk bi ti awayî nîne, ji bilî di beytan de -ew jî qismî û ne misêwa- ku li vir me behsa wan nekîr. Herçî awayê îcrakirina muzîkal e, ew jî bi dirêjahiya rîstan diyar dibe. Helbet "çêrên dawetan" ku li vir me behsa wan jî nekîr, istisna ne. Rêza ferdayan bixwe, bi itîna hatiye neqandin

yan jî diyarkirin.

Ew qebûla giştî ya ku dibêje, îcraker bi xurtî li gorî hêviya guhdaran, civakê performansê xwe diyar dikin, di çavdêriyên min de xwe piştrast nekîr; ji ber wê bi ya min divê ev qebûl bê modifiyekirin. Em wisa bibêjin, wê ne şaş be: îcraker serbest e ku materyalên xwe jî bo îcrakirinê ava bike, lê belê ev serbestî bi pîvanên estetîkî yên civaka guhdaran û îcrakerên din sinordarkirî ye. Hêmanên hunerî yên jî berê ve diyarkirî jî vî serbestiyê sinordar dikin.

Danîna rîstan, ferdayan û hêmanên hunerî dikarin li gorî cînsê îcraker, bêjêrê/a di berhemê de biguhere. Yanî ne tenê cînsê îcraker ê yê bêjêr jî di avakirina hunerê ya berhemê de bi dewra xwe radibin.

* *Goody Jack. The Domestication of the Savage Mind, Cambridge, Cambridge University Press 1977.*

** *Bauman, Richard. The field study of folklore in context, in: Handbook of American Folklore, Richard M. Dorson (Editor), Bloomington 1983, 362-367. Story, Performance, and Event: Contextual Studies of Oral Narrative-, New York 1986.*

*** *Ji vir û pê ve daneyên li jêr jî xebata doktorayê ya li jêr hatine girtin: Turgut, Lokman. Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekarî. Logos Verlag, Berlin 2010.*

Siyaset di îcrayê de

Stranên siyasî di nava van 50 salên dawiyê de bi Kurdî tîra xwe belav bûn. Em siyaseta di nava çûreyên wê-jeya devkî ya jî rûremsê ya li Bohta û Hekarîya de jî dibînin, lê sedema bîçhkirina wê û awayê wê guhertî ne. Em êskere dibînin ku di nava berheman de bikaranîna peyv û gotinên di warê "neteweyî" de "birevertir" çêbûye. Li şûna çiyayên vî Cizîrê, em bi carekê çiyayên Kurdistanê dibihîsin. Nifirên li artêşa dijiman û bangên tohildanê yên li ciwanan jî bi heman rengî di nava performansên jî rûremsê de êdî hene. Yanî tesîra diskursa neteweyî û mîletperestiyê xwe dide der. Lê, em di payizokên tê de doza serbestkirina Ocalan tê kirin de jî, nikarin behsa heman motîvasyona di stranên siyasî de bikin. Mijar çî dibe bila bibe, em dibînin ku ifadekirina eş û azarê, ifadekirina trawmayêkê, eynî weke di gelek çûreyên jî rûremsê de di wan de jî heye. Li vir muhîm e, em jî hev derêxin ku em behsa stranên partîzanî û stranên modern ên bi usûlên berê nakin, lê behsa berhemên çûreyên jî rûremsê yên wejeya devkî dikin.

Jibîrkirin û bîr

Yek jî aliyên mirovan heyrani xwe dihêle yên çanda devkî, ew e ka çawa agahiyan bêyî alîkariya ifadeyên jî derve tê mihafezekirin û neqilîkirin. Bir di vî warî de vediguhere navgîneke mihafezekirina agahiyan. Lê ev bîra hanê û bîra em di peywenda modern de nas dikin, ne yek in. Lewma ya diqewime komemorasyon e. Ew zindî ye û amûrên jî bo ku dewam bike jî bi xwe bi pêş dixê da ku fonksiyona xwe di nava civakê de pêk bîne. Yanî ev fiileke civakî ye, tecrûbeyekê bi temamî ye û ev tecrûbe objektîfîbûna hizir, awir û li gorî rewşê kombîne dike.

Mesela, li cem koçerên Kîça, neqilîkirina hin çûreyan tenê bi organizebûna civaka jî rûremsê mumkin bû. Rûspîyan qewl digotin û rûspî li cem Kîçan jî bav tê, mirov nabe rûspî, mirov rûspî jî dayik dibe. Ji ber wê, bi kontrola xurt a civakî, tiştê dihat neqilîkirin jî

nisbeten baş muhafezekirî bû.

Lê belê neqilîkirinê devkî nabe ku di warê kesan û motîfan hişk bin, li gorî dinamîka civakî tesîrên çihê lê dibin. Ji ber wê jî mirov rehet fêhm dike, gava Ūsivê Kîça dibêje, "koçer êdî neman" ew dibêje, neqilîkirina qewlan jî êdî ne lazîm e. Yanî qewl bi guhertina civakê re veguherîne agahiyan ku kategorîk êdî ne lazîm in.

Jibîrkirin bi xwe jî beşek jî birê ne. Li Mexmûrê gelek îcrakeran behsa berhemên li ser şerên di navbera eşîrên Misilman û yên Êzîdî de kirin û wan got, ew naxwazin êdî van berheman îcra bikin. Em dibînin ku îcraker li vir terçîh dikin ku jibîrbikin, ji ber ku "Kurd hemû bîra ne". Ev tesîra diskursa li ser neteweyê; lê jibîrkirina ku terçîh e weke beşek jî birê, dikare di encama gelek tesîrên din jî xwe bide der.



Bê zar û bê ziman e jiyan, lê diaxive...

► Em ji zarokên li ser wê axê mezinbûyî yê nîr û bawerîya xwe di tûrikê dilê xwe de komkuri, di tavehîvên berbangî de bi rê ketin.

Jiyan simblîk e, dema nava wê tîji nîn be serbilindîyeke bê rêk û pêk pêk tê. Ev hestên zarokatîyê û ciwantiyê ne. Hêdî hêdî perwerdeya xwezayî dest pê dike. Piştî re di nava xweşî, êş û keserên salan de, tîjî dibe û serê xwe ditewîne. Ev serî-tewandin, li hemberî qalibên fêrkirî yê wê wêk "Serê xwe netewîne" rawestandînek e. Ya girîng ew e ku tu yê ji bo çî û li hemberî kê serê xwe bitewîni û ji bo çî û li hemberî kê serê xwe netewîni. Li hemberî desthilatdariyê, li hemberî bêrûmetiyê, li hemberî dijîminê xwe yê çanda te, nasnameya te, xaka te tîne dike, zimanê te dibere û dijîminê bi nav Kurd, bi Kurdî diaxive lê li ser navê xwişk-biratiyê te difroşe û li hemberî ferasetên pergala desthilatdar di kesayeta te de bi cih kirî ku zimanê zarokatîya te ango Kurdî bi te dide jîbîrkirin û zimanê xwe bi te dide jîberkirin, serî netewandin rûmeteke mezin e. Lê li hemberî xaka te ya her bihuşteke wê bi xwîna cangorîyan avdayî, li hemberî dayikên ew cangorî mijandî û li hemberî zarok, kal û pîrên raborî û paşeroja te ne, heta li hemberî beşeriyên li ser wê xakê serî tewandin ne binketin, serbilindîyek e. Ji bir neke serê şilêran jî tewandî ye... Êşên sedsalan tînin ziman ku tenê jinên zimanên dil diaxivin ji wan fêhm dikin.



A. Avesta AYDIN

Wek Rêber Apo dibêje, bi hestên xwe yê zarokatîyê re girêdayî mayî e mebest...

Em ji zarokên li ser wê axê mezinbûyî yê nîr û bawerîya xwe di tûrikê dilê xwe de komkuri, di tavehîvên berbangî de bi rê ketin. Zarokên ji hestên kurdevariyê dîr ketin, di nava dibistanên kapitalîstan ên bi piştaftinê perwerde kirî de, "Wek şûşeyê tîjî av di nivê rê de şikestin, tîne nebûn lê ava wan ber bi hest û xakên biyanî ve herikin" û ji xwe dîr ketin, nikaribûn xwebûna xwe ava bikin û bi saxî mirin.

Yek ji zarokên mezinbûyî an jî mezinên zarokatîya xwe bi xwe re anî hebûn. Wê pelên çîl û qerqas bûn ew, li ser qencî hatibû xêzkirin û qenc bibûn. Ango zarokên agir û rojê bûn ew. Derketineke şoreşgerî bû sekna wan. Hin ji wan jî dest, ling, çavên xwe derb xwaribûn. Li şûna ziman birînen dest, ling û çavan diaxivin.

Tolhildana hestan Jiyan bû

Bi tenê yê ji dilê xwe derxarî, ti carî nehatin ziman. An jî pir axivîn, lê parvenekirin. Lixwekiribûn

peyvên wan ên di encama lédanekê de ji parvekirinê xeyidî. Ji hestên wan nîşan gir-tibûn û gulebaran kiribûn dilê wan. Guleya jehrî wê her carê nîşana xwe şaş nekiribû. Lewma cemidibû awirên wan. Hin ji wan derman kirin birînen xwe. Hin ji wan jî li şûna ku derman bikin dilê xwe, şibiyabûn kujerê xwe yê ji dergûşekê/î kujerek afirandî. Wan jî kuştin hestên hin kesên din ên pak û paqij. Tolhildana hestan bû ji bo wan jîyan...

Em xwe dispêrîn deriyê dilê xwe

Avakirina pira di navbera "Ez" û "Em"ê de ye jîyan. Ji ber ku takekesa/ê bê civak nabe. Wêk ser-rast bike tespîta min ji bo xwe kirî ya "Tenêtiya min şîrika emrê min e, bi ku ve biçim li wir benda min e" Rêbertî bi tespîta "Takekesa/ê bi tenê tîne ye. Takekesa/ê civaka wê/wî têkçûyî dibe, lê ew jî bi biranînen civaka xwe ya têkçûyî li ser piyan e" di ser tenêtiya min û me de hat. Gelo Baba Tahîrê Ūryan di vê serdemê de bijiya û rastî wî hostayî bihata, wê dîsa çarîka xwe ya bi navê; "lîlahî biçim cem kê biçim cem kê/ Ez ku bê dest û pê me biçim cem kê/ Hemû min biqewrînin tême cem te/ Ku tu jî biqewrîni biçim cem kê" wê bi vî rengî biqedanda!

Di nava civak û mirovahiya bi aqil de, em xwe dispêrîn deriyê dilê xwe, li zengilê wî dili didin, dema dil me bibihîse û bihewîne em diaxivîn. Ew jî guhdara bêdeng e. Ya rastî ew e ku peyv carinan li ber dilê tîjî, bê zar û ziman e...

Belê ez jî wêk her zarokê/î bi biranînen pîrika xwe mezin bûm. Dikarim bibêjim ku du jiyanên min ên zarokatîyê hebûn. Li bajêr jî dayik bibûm, bajaribûm lê di heman demê de gundewarbûm ku cih û ware pakîyê ye. Ji ber ku dema dibistan diketin betlaneyê yekser me berê xwe dida gund û ez diçûm cem pîrika xwe. Di erebeyê de tim kasetên dê û bavê min ên dengbêjiyê hebûn. Li gel wan stranên temaşekirina xwezaya Kurdistanê, bi min re hestên bêhempa ava dikirin, ez bi kurdevarîya xwe dihisiyam. Esir bû di biranînen min de, dema min dengê Radyoya Rewanê bihîst. Li gel bilûrê, kilama Bêrivanê dihat ziman... Xwe bi dengê xwezayê re kiribû yek, ji aliya din ê çemê Erez xwe berdabû ser gundê me. Gundiyên ku hemû xizmên hev bûn, bêdeng bibûn, Efoyê Esed bang li Bêrivanê dikir û digot;

"Were lê bêrivanê, kubar kubar xwe ba neke, gundo,
Cêrê xwe hilde, di kaniya piştî mala me da qesme neke,
Alîkî cegera min î sax maye, xirab neke, dimrim lê..."

Çirokên qala pişt çiyayê Qaf dikin

Di ketina gund de, şivan û gavanan naxira çêlek û pezan ên li çolê diçerîyan vedigerandin gund, bêrivanan berx û golik berdidan û wan jî baz didan û di nava ewqas mî û çêlekan de, maka xwe nas dikirin û diçûn guhanê wê digirtin û dimijîn. Piştî re roj diçû ava, kevaniyan bêhna xwe vedidan û herkes diket xewa şîrîn. A di wê keliyê de, pîrika Helê ya herdu çavên wê tarî, dest bi çirokên di piştî çiyayê Qaf de dikir û em di xew re diçûn. Ev biranînen ku hafîzaya min çêkirin, jiyana rojane ya zarokên xizmên me yê li gund bû. Lewma ji bo wan balkêşiyê wê tîne bû.

Li hemberî gundewariya ku ji bo xwendina dibistanên Tirkan neçar dima berê bide bajarên, ez jî li pey dengê xweza, ajal, dar û berg, dengê ku bi rêya radyoyêke biçûk xwe digihand guhê min ketibûm, ya rastî li pey dengê dilê xwe ketibûm. Lêgerîna min a zarokatîyê dest pê kiribû. Ez bi ku ve bibirama, min qebûl bû...

Bi kîneke mezin

Cara duyemîn di zaningehê de biranîn bûn birînen min, careke din bi kurdevarîya xwe hisiyam. Di rojekê de min biryara xwe da, rastkêşa xwe ya avahîsaziyê û metaryalên projeyan da hevalên xwe yê Kurd û vegeyîyam. Di rê de nûçeyên ne bi xêrê dan nûçegihanên Tirk û gotin, li Dîgorê bi hezaran kes li hemberî dewletê meşîyan û 17 terorîst hatin kuştin. Navê kurapê min û hevalên min ên zarokatîyê dihatin ziman. Dem 14 ê Tebaxa 93 an bû. Bi şev li Qersê peya bûm. Negihîştibûm meşê, yekser çûm nexweşxaneya ku hevalên min ên birindar tê de bûn. Piştî 10 salan ez dîtîm û nas kirim. Piştî re jiyana xwe ji dest dan... Her kes li morgê li miriyên xwe digeriyan. Roj 15 ê Tebaxê bû. Ew roj ev roj e bi kîneke mezin têdikoşim li hemberî dijîminê xwe yê çand, ziman, nasname û canê me stendî.

Dibêjin dema cangorîyek dikeve axê, stêrkek dirije. Dibe ku şilêrek be jiyan a serê xwe bilind nake û li ezmanan mêze nake da ku cangorîyêke/î din ji nerije û tim bibirîqe.




Enerjiyeke nûjendar, paqij, domdar û pêbawer enerjiya siberojê ye

Enerjî çî ye?

- Gelek teşeyên enerjîyê hene, wekî germahî, tav, û herwiha enerjiya mekanîkî ku ji hêla makîneyan ve tê afirandin, enerjiya kîmyewî ya ku ji rûdana bertekên kîmyewî çêdibe, enerjiya elektrîkê, enerjiya hîdroelektrîkê ya ku ji avê tê hilberandin, enerjiya tîrêjê û enerjiya nukleerê.



Ji gava ku insên agir naskiriyê ve, enerjî (vejen, wîze) nas kir û di jiyana xwe de bikaranî ji bo pêdiviyên xwe yê rojane wekî ronîkirina tariyê, pi-jandina xwarinê û germkirina cihê lê diji. Çika êgir a ji lihevketina du kevîran peyda dibe rengeke ji rengên enerjîyê, ji ber vê jî, kevîr bû çavkaniya yekemîn a



Hikmet HESSO

enerjîyê di destê mirovan de di destpêka dîroka mirovahiyê de û paşê êzing, dar û ardû bûne jêder û çavkaniyên bidestxistina têhn û germahiyê.

Di gerdûnê de du tiştên sereke hene, tiştin zindî û tiştin ne-zindî, jixwe tiştên zindî bi ruh in, bi hêz in, bi liv û tevger in, lê belê tiştên ne-zindî guhartinên xwe, hêz, liv û tevgerên xwe bi saya bandora hêzên derveyî wan tiştan peyda dibin, ew bandorkirina ji derve "ENERJÎ" ye, ku dihêle duriv û rewşên wan tiştan bêne guhartin. Ango, enerjî hêzeke fizîkî ye dikare tişt, laş û heyînên di xwezayê de çalak bike, bi tevger bike û rewş û statûya wan biguhe-rîne. Bi kurtasî, enerjî wekî hêza ku karekî pêkan dibe tê pênasekirin.

Gelek teşeyên enerjîyê hene, wekî germahî, tav, û herwiha enerjiya mekanîkî ku ji hêla makîneyan ve tê afirandin, enerjiya kîmyewî ya ku ji rûdana bertekên kîmyewî çêdibe, enerjiya elektrîkê, enerjiya hîdroelektrîkê ya ku ji avê tê hilberandin, enerjiya tîrêjê û enerjiya nukleerê.

Enerjî qet tune nabe û ji tunebûnê jî peyda nabe, her û her miqdara enerjîyê di gerdûnê de yeke ne zêde dibe ne jî kêr dibe, lê ew ji teşeyekê ber bi teşeyekê din ve tê veguheztin, weke nimûne, enerjiya kîmyewî vediguhiize enerjiya germahiyê, enerjiya elektrîkî dibe enerjiya mekanîkî, enerjiya tîrêjê dibe enerjiya elektrîkî, û herwisa an jî berevajî, ev yeka jî wekî zagoneke xwezayê tê pey-jandin.

Girîngiya enerjîyê û çavkaniyên wê

Di destpêka jiyana mirovan de li ser rûyê erdê wan xwe spartin hêza laşê xwe (enerjiya fizîkî), zend, bend, mil û piştên xwe di karê xwe yê rojane de bikaranîn, paşê gav bi gav, zanyariyên xwe pêşveçûn, û bi riya enerjiya avê tekerên darî çerxkirin û aş avakirin heta gihane afirandina makîneyan û dûv re jî bikaranîna komir û petrolê wekî çavkaniyên enerjîyê yê sereke û girîng.

Di roja me ya îro de enerjî bûye pêdiviyekê herî pêwîst û ihtiyak bi wê her kêlikê zêdetir dibe, di xaniyên me de ji bo ronahiyê, klîma, sarinc û hemû alavan, û li derve jî bo karûbarê xebitandina makîneyan, kargehan, çûnûhatin û veguhastinê. Tê zanîn ku enerjî bi hemû terz û cûreyên xwe roleke bêhempa dilîze di pêşketina aboriya civakan de, û pir caran hêz û biserketinên welatan tînan pîvan bi xerckirin û bikaranîna enerjîyê di jiyana mirovan de û di pêşxistina pişesazî û binasaziyên sereke yê wan welatan. Di jiyana me de gelek cûreyên enerjîyê têne bikaranîn, di nav de enerjiya rojê, enerjiya ku ji petrol û komir tê bidestxistin, enerjiya elektrîkê û hwd, lê enerjiya elektrîkê stûna sereke ye ji bo geşedana civakî, zanistî û pişesaziyê ye, û hem jî motora sereke ye bo pêşveçûn û pêşketinê di warên jiyandê yê cûrbecûr de.

Carcaran di navbera cûreyên enerjîyê û çavkaniyên enerjîyê de, anga forma bingehîn a enerjîyê de tevlihevi çêdibe û ji hevdu nayên cudakirin, bêguman enerjiya ku digihîje ber destên xerckeran, wekî elektrîk, gaza navmalî, sotemenî (benzîn, mazot), rûnên mîneral û kelûpelên çêkirî bi tevahî ji enerjîyê di forma xwe ya bingehîn a çavkaniya resen de cuda ye. Wek mînak, elektrîka em li mal û kargehên xwe xerc dikin di santralan de ji çavkaniyên resen û cihêreng tê hilberandin, wekî petrol,

gaz û komir.... Av, roj û ba çavkaniyên din ên hilberîna elektrîkê ne, ev jî aliyekî ve, ji aliyê din ve çavkaniyên enerjîyê bi xwe li ser du beşên sereke têne dabeş kirin, çavkaniyên enerjiya kevîr (ne nûjendar, di binê erdê de ne û bi kolandinê têne bidestxistin) û çavkaniyên enerjiya nûjendar. Em dikarin wan bi hûrgilî wiha şirove bikin:

1- Çavkaniyên enerjiya kevîr (Enerjiya fosîlê):

Çavkaniyên enerjîyê yê ku nayên nûkirin, di nav de gaza xwezayî, petrol û materyalên ku jê têne çêkirin, komira kevîrî, atomên ûranyûmê û gaza hîdrokarbonê ya şil e. Evana bi kolandinê ji kan û gencineyên bin erdê têne derxistin û bi şewrtandina wan di hewayê de germahî jê tê bidestxistin ji bo bikaranîna di warên cihêreng de.

Di sedsalên hijdeh û nozdehan de enerjiya fosîlê, nemaze komira kevîrî, bi berfirehî hate bikaranîn û geşedaneke gewre di warên teknîkî û pişesaziyê de pêkhat, lê di dema me ya niha de petrol rola herî mezin dilîze di peyda kirina daxwaza enerjîyê de, ji ber ku petrol heta radeyê mezin bi hêsani jî binê erdê tê derxistin û filterkirin û veguhastina wê jî ne pir biha ye. Cihana me ya hevdem heta niha bi piranî xwe dispêre enerjiya fosîlê (rêjeya bikaranîna enerjiya fosîlê digihîje 79.6% ji tevahiya enerjiya tê xerckirin li seranserê dinyayê). Hêjayî gotinê ye ku ev cureya çavkaniya enerjîyê ne domdar e û wê rojê ne zêde nedûr biçike û bi dawî were, tê pêşbînîkirin ku di nava 100î heta 150î salî de enerjiya fosîlê wê biqede. Lê tiştê herî balkêş der barê wê enerjîyê de, ew e ku mixabin nepaqij e û zîrêreke pir mezin li ser jîngeh û xwezayê çêkirîye û çêdike jî. Herweha, baş tê zanîn ku hilperîna karbondioksîtê, germbûna gerdûnê, qirêjî ya hawîrdorê û guhartinên tûj di pergala xwezayê de karigeriyên neyînî ne yê bikaranîna enerjiya fosîlê, ku dibin sedema çolbûn û hişkesaliyê û peyda bûna hin nexweşiyên.

► Heta roja me ya niha enerjîya nûjendar digihêje tenê rêjeya 20% ji tevahiyê enerjîya tê xerckirin li seranserê cîhanê, anku piraniya enerjîya tê xerckirin enerjîya kevna (fosîlê) e, ev jî tehlûkeyeke mezin çêdike li ser hawîrdor, avhewa û geşedana domdar li seranserê dinyayê.



2- Çavkaniyên enerjîya nûjendar:

Ev çavkaniyan bi çavkaniyên enerjîya paqij û domdar jî tene bi navkirin ji ber ku ji xwezayê tene bidestxistin, qirêjiyê li dûv xwe nahêlin û qet naqedin û naçikin, û bi ser de jî herûher xwe nû dikin, û di nav beşên jêrin de tene dabêşkirin:

1- Roj: Tene û tava rojê tene bikaranîn ji bo bidestxistina germahiyê û hilberîna elektrîkê bi şewazên cihêreng, li malan û di avahiyan de bi riya sobeyên ava germ û li kargeh û bajaran bi riya generator û santralên elektrîkê. Şaneyên fotovoltaiik û panelên tavê bi taybetî hatine peyda kirin ji bo veguhaztina rasterast a enerjîya rojê bo enerjîya elektrîkê.

2- Ba: Ji bo wergirtina enerjîyê ji bayê, fîrîrk û tûrbînên taybet tene bikaranîn û tene girêdan bi generatorên hilberandina elektrîkê, ji demên kevin ve mirovan sûd wergirtine ji enerjîya bayê di çerxkirina kevîrê aşan û hilkişandina avê ji bîran

û herwiha di ajotina keştî û gemiyan de.

3- Av: Herikandin û lebata avê wekî lêmişt û lehiyê hêzeke gelekî mazin bi xwe re çêdike û enerjîya mekanîkî peyda dike, loma li ser çeman bendav ava dibin û bi riya tûrbîn û generatoran enerjîya avê wêdigere elektrîkê. Ji ava gol û deryan jî sûd tê wergirtin di hilberîna enerjîyê de bi riya bikaranîna hêza pêlan û tene ser ruyê avê û binê avê.

4- Sotemeniya biyolojîk a domdar: Ji hilberên çandiniyê û darên neft-hilberîner derdikeve, loma hin dar û nebatatin taybet tene çandin ji bo ku bibin alternatîva enerjîya fosîlê.

5- Bermayên xwezayê: Ji bermayên dar, ber, şênkatî, çawîr, ajal û dewê tene bidestxistin û di santalên hilberîna elektrîkê de enerjî jî tê wergitin.

Ev çavkaniyên enerjîya nûjendar gelekî sûdmendin ji ber van sedeman:

- Domdar in, hêrgav xwe nû dikin û li seran-

serê cîhanê berdest in, loma welatên xizan jî mîna welatên dewlemend dikarin bikarbin.

- Paqij û jîngehparêz in, alîkar in di kêmkirina hilperîna karbondioksîtê, germbûna gerdûnê û guhartinên avûhewayê de û herweha rê li ber barana asîdê ya zirardar digirin û çopê li dûv xwe nahêlin.

- Lêçûna bikaranîna van çavkaniyan di hilberîna enerjîyê de roj bi roj kêmtir dibe, mînak, niha bihayê panelên tavê biqasî 90% kêmtir bûye ji bihayê wan a sala 2010'an, jixwe ba, tîrêja rojê û ava çem û deryan bêbiha ne, tene teknoloji, alav û makîneyên hilberîna enerjîye divê berdestbin.

- Teknoloji, amûr û makîneyên tene xebitandin ji bo bidestxistina enerjîya van çavkaniyan ne aloz û dijwar in, ji ber vê yekê li hemû welatên dinyayê tene çêkirin, siwarkirin û şuxilandin û ev jî pir derfetên kar ji hemwelatîyan re tîne meydanê.

Encam

Heta roja me ya niha enerjîya nûjendar digihêje tenê rêjeya 20% ji tevahiyê enerjîya tê xerckirin li seranserê cîhanê, anku piraniya enerjîya tê xerckirin enerjîya kevna (fosîlê) e, ev jî tehlûkeyeke mezin çêdike li ser hawîrdor, avhewa û geşedana domdar li seranserê dinyayê, loma plansazî tene çêkirin û proje tene saz kirin da ku ew rêjeya zêde bibe û bigihêje 80% heta sala 2050î.

Lûtkeya navdewletî ya ji bo karûbarê avhewayê di îlona 2019an de soza xwe nûkir ku kar were kirin ji bo ku di 12 salên bîna de zêdebûna germahiya gerdûnî bi 2 pileyan bê sîno darkirin, û belku bi 1.5 pileyê li gorî lêkolînên zanistî yê ku van rêjeyan bera-wird dikin bi astên ku berî Şorşa Pişesaziyê di sedsala hijdehan de serdest bûn.

Xwe spartina enerjîya nûjendar û bilindkirina asta sûd wergirtina ji xerckirina enerjîyê di hemû warên bikaranîna wê de armancên bingehênin ji bo lûtkeyên avhewa yê.

Ajansa Enerjîya Nûjendar a Navneteweyî pêşbînî dike ku elektrîk (li şûna şewitandina komir û petrolê...) dê bibe dabînerê sereke yê enerjîyê li seranserê cîhanê da ku para elektrîkê ji rêjeya kêmtirî 20% di sala 2019an de bigihêje rêjeya 86% ji tevahiyê enerjîya tê xerckirin di sala 2050î de. Bi vê yekê xerckirina elektrîkê wê ji du qatan bêhtir zêde bibe di warên pişesaziyê û veguhas-tinê de, û di encamê de 75% ji weşana gaza karbondioksîtê wê were kêmkirin.

Qezenca herî gewre wê bibe: Enerjiyeye nûjendar, pagij, domdar û pêbawer ji bo tevahiya mirovatiyê.



Bêjînga dîrokê û hunera sexte

► MIHEME PORGEVOL

Huner û politîka du beşên kevna yê felsefeyê ne. Herdu ji bi jîyanê û livên lêgerîn û sazkirina jîyanê ve girêdayî ne. Diviyatîya xweîfadekirina homo sapiens, bi zîman re bîngeha hunerê datîne. Dîsa nihiçkên seretayî yê homo sapiens (yê mîna têrbûn, ewlehi, seks û hwd.) politîkayê afirandin da ku homo sapiens karîbe erka sazkirina jîyana xwe bigre destê xwe.

Şarîstanî bi felsefeyê ava dibe. Dibe ku mirovahî ji pîrsên mîna "Ez çi me?", "Fîrqa min û xwezayê ji hev çi ye?", "Têrbûn û birçibûn çi ne?" derbasbûbe lê pîrsên mîna van pîrsên seretayî, bîngehê felsefeyê û afirandina şarîstaniyê pêkan dike. Felsefeya şarîstaniyê li ser du xalan ava dibe: Şênberî û razberî. Dijberîya van xalan xwe di hemû beşên jîyanê de ji nîşan dide. Em ji vê dijberîya (ku bêyî wê tu tişt nikare bê fikrandin û afirandin) di nava jîyanê de ye re dibêjin diyalektîk û şarîstanî ji bi diyalektîkê pêkan e.

Felsefe dipirse

Dahûrandina têkiliya di nav felsefe û diyalektîkê de tewqetwêqî ye. Felsefe xwe bi diyalektîkê ava dike, diyalektîk ji xwe bi felsefeyê. Felsefe, diyalektîkê digre nav xwe lê ji aliyekî din binêrî diyalektîkê ji felsefeyê digre nav xwe. Ev prensîp di bîngeha hemû dîsîplînan de ji heye. Lewra her dîsîplîn xizmeta şarîstaniyê dike û divê jê be ji. Heta mirov dikare bêje ku hemû fikrandin û tevgerînên mirovahiyê di xizmeta şarîstaniyê de ne. Felsefe dipirse, sapiens dike.

Ji aliyê din ve jî, ji ber ku mirov bi aqil û hişmendîya 'xwebûn'ê ji xwezayê cuda dibe, cihê reaksiyonên tesadufî di mîrasa mirovahiyê ango di şarîstaniyê de tune. Divê her gavên civakî, politîk, çandî û hwd. ku tî avêtin ji bêjînga diyalektîkê derbas bibin û werin sazîkirin. Ev asta peresîna dîrokê ye. Yanê di her gavî de mekanîzmaya bêjîngê dimînin xizmeta xwe ya di bin siya şarîstaniyê de didomînin, yê din jî dibin dîrok û tî jîbirîkirin. Ev prensîp teqabulî peresîna dîrokê dike. Piştî ku ev asta temam bû, êdî felsefe dikare bikeve dewreyê da ku pêşîya îhtîmala bêşansiyên di nav tesadufan de bibirre. Bi vî awayî jî kontrola şarîstaniyê digre destê xwe. Siyaset, çand û dînamîkên civakê yê din bi vî awayî tîne sazîkirin. Herakleitosê Yewnan, Yîng Wang a bîngeha felsefeya Çînê, Qurana dîne îslamê û hwd. xwe bi vî mekanîzmayê didin şixulandin. Xweîfadekirina wan jî bi vî diyalektîkê ye. Ew birêxistinî tevgerên mirovahiyê, bi amûrên ku li ser bêjîngê mane dikin.

Politîka û huner beşên felsefeyê ne

Têkiliya ku huner û politîka bi civakê ra datînin ji wisa ye. Huner û politîka du beşên girîng yê felsefeyê ne. Armancên huner û politîkayê ji bo li ser xwe mayîna şarîstaniyê xizmeta felsefeyê dikin û yek in: Sazîkirina hêst, liv û tevgerên homo sapiens. Ev herdu dîsîplîn deng li mirov û civakê dikin. Bi herman şewazê em dikarin bêjîngê huner û politîka ji bi hev ve girêdayîne û nikarin ji hev biqetî. Lewma feylesofên kevna bi giştî li ser van herdu dîsîplînan hûrbûne.

Ji bo tîkiliya huner û politîkayê baş were fêmkirin divê mirov prensîbên van herdu dîsîplînan yê wêkhev bizanibe. Wêkheviyên di nav huner û politîkayê de dikarin bi rêya dîrok û etîmolojîyê bêne aşkerakirin. Wêkî tî zanî Aristoyê Yewnan di felsefeya xwe de pîrî cara ji bo sazîkirina civakê qala rola hunerê dike. Tragediyayê hemdemê xwe di vî çarçoveyê de dinirxîne û li gorî wî divê huner di xizmeta armanca sazîkirina civakê de rol



WÊNE: MAX BECKMANN

► Ji ber ku mirov bi aqil û hişmendîya 'xwebûn'ê ji xwezayê cuda dibe, cihê reaksiyonên tesadufî di mîrasa mirovahiyê ango di şarîstaniyê de tune. Divê her gavên civakî, politîk, çandî û hwd. ku tî avêtin ji bêjînga diyalektîkê derbas bibin û werin sazîkirin.

bigre. Rolê hunerê jî ajîkirin û kedîkirina civakê ye. Dîsa li gorî felsefeya wî divê politîka ji rêvebirîya civakê bike. Yanî huner ji politîka ji ji bo herman armancê hene. Ew armancê ji pîrozîkirin û mezînkirina dewletê ye. Di vir de tiştê ku Arîsto jê ra dibêje 'dewlet' li gorî çaxê xwe tî maneya şarîstaniyê. Lewra beriya 2300 salan dewlet û şarîstaniyê weke herman tiştî dihatê qebûlîkirin. Li gorî Arîsto ku dewlet tunebûna dê mirov hov û har bimana. Bi saya dewletê mirov ji ajalan cuda dibe. Arîsto dewletê weke tezahura rêveberê pîroz dibîne. Yanî em dikarin bêjîngê li gorî wî dewlet prototîpa Welatê Xwedayan (an bi wateya xwe ya din ya ku hemdemê wî Platon binav dike Ci-vaka Îdeayan) e. Divê ev prototîp baş were nîşandan da ku civak li gorî îdeayan tevbigere. Ev ramanek tîkiliya huner û politîkayê ya di nav civakê de ye û xwe bi rêya kumûlasyonê dîroka civakê nîşanî me dide ye.

Ji bo civakê ne

Bi rêya etîmolojîyê jî em dikarin girêdana politîkayê bi hunerê ra bibînin. Peyva "politîka" di zîmanê Yewnanî Kevna de ji peyva "polis" (bajar, cihê ku civak lê dijî) tî. Wateya "politîka" yê sazîkirin û rêvebirina mijarên ku civakê leqedar dikin e. Di vir de êdî em dikarin li raman û şîroyên nûjentîr yê derbarê hunerê de binêrin. Li gorî teorîsyenê hunerê Ernst Fischer ji bo hunerê ava bibe divê xwe li ser çar xalan bihûne. Xala yekem û girîngtirîn jîyar, yanî tecrubeya jîyanê ye. Xalên din jî bîr, vegotin û form in. Lê ku jîyar nîn be huner ne pêkan e. Ji ber ku xewn, xeyal, fikir, şîrove, û hwd. girêdayî jîyanê ne. Di jîyanê de biwate dibin û di jîyanê de şiklên xwe yê dawî dibînin. Weke mînak: Di sedsa 15. de kesî di xewna xwe da balefir nedidîtin. Piştî ku îcadîkirin û hebûna balefiran ji aliyê mirovan ve hate tecrubekirin, êdî balefir dikaribûn bêne xewna mirovan. Di vir de tiştê girîng ew e ku xewnê me bêyî iradeya me pêk tî. Yanî ku em nexwazin ji jî ber ku hebûna wan hatiye tecrubekirin êdî tehayula balefiran ji pêkan e. Jiyar di vir de ne dîtî an jî şixulandina balefiran e. Jiyar qebûlîkirina

hebûna balefiran e. Tewqetwêqî di vir de dest pê dike. Balefir di jiyarê de, jiyar di jîyanê de ye. Ev jiyar di halê xwe yê xwerû de ye. Êdî herkes û her dîsîplîn dikare vî jiyarê li gorî xwe bihûne. Divê hunermend jî vî yekê bi awayekî estetîk bihûnin. Di bîmînakîkirina bêjîngê de: Tecrubeya hebûna balefiran êdî li ser bêjîngê ye û dikare ji bo sazîkirina fikir, raman û tevgerên mirovan (û yê civakê) bêne sazîkirin were şixulandin. Lewma êdî balefir parçeyek şarîstaniyê ye.

Êdî em jî dikarin qala tîkiliya huner û politîkayê bikin. Ger hunermend vî jiyarê li gorî bîrdozîya (îdeolojî) xwe ya politîk bihûne ew berhema ku ji aliyê hunermend ve hatiye afirandin dibe politîk jî. Ji ber ku bîrdozî hunerê jî, politîkayê jî, çandê jî digre nava xwe.

Berhem li gorî armancê ye

Divê hunermend berhemên xwe li gorî esl û esasên jîyana ku dixeylê biafirîne û bîngeha berhema xwe jî ji her aliyê ve li gorî vî xeyalê biavêje. Divê ev berhem bi aliyên teknîkî, hêstiyarî, ramanî û îdeolojîk ve lihevkerî be. Berhemek hunermendeke marksîst ku bi pîvanên kapîtalîzmê were afirandin encax kare bibe kitsch. Ango weke di vî pêşgotîne de tî gotin: Bi kerê xelqê dernakevî rê.

Di dawiyê de em dikarin bêjîngê: Herkes xwedî bawerîyek politîk û îdeolojîyê e. Ev bîrdozî her tişt jî dibe: Marksîzm, lîberalîzm, kapîtalîzm, oldarî û hwd. Gava hunermendek marksîst berhemekê biafirîne divê ew berhem bi her awayî lihevkerîyê bîrdozîya afirînerê xwe be. Hunermendek ku jîyanek anarşîst tehayulî dike nikare bi teknîkên klasîk xerakirî bikarîne. Ji bîlî vî lihevkerîna estetîk û bîrdozîya berhemê pûç dibe û ew berhem nagihîje armanca xwe. Lewma berhem fikrê derbarê jîyanê de yê hunermend dide der. Ger berhemek ne li gorî armanca bîrdozîya hunermend hatibe lêkirin (ev îlle xwe dide dest) û ku ew hunermend hê jî li berhema xwe xwedî derkeve an ew berhem sexte ye an jî hunermend sextekar e.

XALO MARKET

(...)

*zarokek bûm ez ji
wekî her zarokî, fêkiyê rojê
wekî her kesî ji dara dêya xwe*

*ketim erdê ez ji
gawakî her fêkî bikeve ji darê
her stêr gawakî birije erdê...*

Arjen ARÎ